# Memo kew berda

Roman

Hesen îbrahîm

–1–

– sipêde bû?

– erê, erê sipêde bû.

– ê?

- Sipêde bû,hêşta dinîya baş ron ne bibû. Dengê kuxka babê min dihat,karê nivêja sipêdê dikir.

– wesa zü bû?

– erê..Dema dengê qotana dergehê hewşê hatî,min lêva perda pencera  jûra xwe veda,hêşta dinîya baş rûn ne bibû!

– ü paşî?

Serê xwe bilind kir,berê xwe da banê zîndanê axînkek veda.

– bükê gût,xudê xêr kit,eve kîye?!

Hizra jihevala dizî,lê livîna ewê birex ve zivirande suhbeta ü.

– min gût,eve zirnabêje,hate xelatê xwe.

Wê gût,qet bawer neke,zirnabêj hosa yê bê meirîfet bit,vê berê sipêdê me jixew rakit...!

Min gût,belê bawer bike,ma zirnabêja çi heye jivan xelat û şabaşa zêde?Ew jî her çend heyva carekê,eve jiber xatira çavên te,min sed dînar bû ü amade kirin..

Wê bidengekê xemgên ve gût,nîveka jîyê min xelat bit heker zirnabêj bit..!

Bê deng bû.xwe kire qormik,hizra gîyanê ü digel xwe bir.

– paşî?

Serê xwe bilind kir,berê xwe da cihê dengî.

– qotana dergehî zêde bû..

**– ma kesê venekir?**

**– heta babê min gopalê xwe dîtî û qesta dergehî kirî..**

**Bêhna gûhdara teng bû,dû sê ya pêk ve gûtin**

**– ê?**

**– dergeh jibin kirin.wek gurgên har qesta jûra me kirin.**

**– gelek bûn?**

**– min dilêva pencerê ra dîtin,çewa babê min di dane ber qontaxên kilaşînkufa.**

**– ê.. ê ü paşî?**

**– dergehê me her ne qotan.**

**– te bû wan vekir?**

**– ne,ne ez ne gehiştim bû wan vekim.Dane ber pestalla ü şikandin û hildane jûr.**

**– çi divîyan?**

**– ez divîyam..Milên min girtin ü ez dame ber qontax ü tep û mista û birime derê.**

**– ma te çi kir bû?**

**– çi nine.**

**Dengekî gût:**

**– ew dergeh qotan ne zirna bêj bû?**

**Kenî bilind bû**

**– heker zirna bêj ba,ez da livêrê çi kim..!**

**– 2 –**

**Şev û roj dizikê wê bindava tarî da bûne êk.**

**Mêvanên bindavê oksicînê jisîhên êk didizin.**

**Cih tenge,Xwarin û vexwarin her çend roja carekê ye,mîztin ü roytin dicih daye.**

**Mirin newêrt xwe nêzîkî gîyanê wan bikit.**

**Îzrayîl yê maye asê diwê bindavê ve,çi kun nînin wan gîyanên didestada beref asmana bibit.**

**Haha îzrayîl dê gîyanê xwe jidest dit,lê heker ü gîyanê xwe jidest da,kî dê gîyanê ü bite esmana?!**

**Çavên hemüya wek roja qîyametê bibanê serê wan ve dizîqin.kes kesê nabînit,kes çi hizira nakit,kes çi hesta nakit.**

**Hemü peykerin yên lihîvîya xoda persta da wan peykera biherşînin,yan xoda bend bête xoarê û birîyara nemana wan îmza bikit.**

**Îsa yê xaç kirîye,hevalên ü dibê hestin,dimestin,çi jê naên.**

**Cih nedîyare,kesê ageh jiNalîna wan nîne,yên bûyne ekterên şanûyeka bê bîner.**

**Şanû tarîye,ekter êk û dû nabînin,tinê biaxînik û Nalîna cihê êk dizanin.**

**Her êk rolê xwe biserketî dibite serî.**

**Derhêner nîne,ronahî tinê ew çirîskên jiçavên wan dibirisqin.**

**Muzîk Nalîna wan kelexên dibin pên îzraylî jibû qûrtal bûna dawyê xebatê dikin..!**

**- ez ne bûm.. Ez ne bûm.. Min çi nekirîye..**

**-......**

**- min ageh jiçi nîne, ez çi nizanim..**

**-.....**

**– heware, heware,ez mirim ez kuştim..**

**Destekî sipî jinav wê taryê dirêj bû ser enîya ü**

**- xwe ragire,xwe liber bigire..**

**Destê xwe jûrda bire xwar.**

**- wesa dîyare jirûyên te,tû yê gencî..?**

**- tû kî?**

**- ez jî wek te girtîme.**

**- min çi nekirî ye,min kes ne kuştîye..!**

**- kesê jime çi nekirîye.**

**Digel firîna gîyanê mêvanekî dî û bêy destqotan, ew dîmen bidaü hat.**

**Her barê îzraylîyê giran dibit,her oksicîn ya kêm dibit.**

**Jor bê deng bû,ewên hêşta diqolaçên dilê xweda gîyanê xwe veşartîn,yên lihîvîya silava îzraylî.**

**- hewe çi kirîye?Hün bû girtîne?**

**Dû sê axînik hatine gûha.**

Ü destê hêşta liser enîya ü gût

– ma te çi kirîye?

– min çi nekirîye,ez zava bûm,şeva zavatîya min bû, nehêlan kes bête sersubehîya min,nehêlan dayka min,babê min,bêne serê min.nehêlan kes zavatîya min pîroz bikit.

Ü destê sipî her serê ü û enîya ü perxandin, bêhna ü fireh bû,birex kelexê ü yê nîv mirî ronişt ü da ber sîngê xwe yê xünelû.

– divêt tû xwe liber bigirî,hişîyar be,xwe asê ke,bila çi tişta liser te negirin.

– ez kuştim,ez neşêm xwe ragirim,wan çi divêt ez amade Me,bila min bikujin,mirin hizar cara baştire ji jîyana divî halî da.

- ne, ne hişîyabe,wan ew divêt,wan divêt tû stûyê xwe bikîye didestên wan da,da ew bibirin,xwe liber bigire,bila ew bipeqin û çi jite nezanin.

Her çende gez û meqes didestên wandane,wan çi bivêt dê wê kin,lê bila bipeqin heta tiştekî jime bizanin.

Mirinê xwe nêzîkî gîyanê hemüyan kir,hind digel xwe birin,hind man dizifiroka dijwara mirinê da überevanî jiwan çend rojên mayn jijîyana xwe kirin.

şer ü berevanî berdewam bûn.

– 3 –

Firçê xwe yê bûyaxê lidûyv selîqa dehol ü zirnayê liser wê pêlava dikuşa üda digêra.Diberra stiran ü peste digûtin,dest û milên xwe dihejandin.

Piştî bihayê wê pêlavê jî wergirtî,bû cara dehê parên xwe hijmartin.

Bişkurîn biser lêva ket.

– eve min xelatê şêrku kum kir,ez dê dû sê pêlavên dî jî bûyax kim,da nan û masitî pê bikirim ü dê evro êvarî xwe linîva dîlanê hejînim.

Kar bese,çucar xilas nabit,evro şahîya baştirîn hevalê mine,divêt ez linav şahîya ü da bim.

Hêşta jibenda hizra rizgar nebûy,pestaleka leşkerî ya tozkeü,hizrên ü yên biçûk digel sindûqa ü ya bûyaxê ditozê werkirin.

– zü ,sebab,baş paqij bike,ez yê bilezim..

**Çavên ü yên biçûk biwê pestalê ketin.hizra bire gûtinên dayka ü:**

**- babê te leşkerê seddamî kuşt,dane ber pestala heta lipêş çavên me hemüyan gîyanê ü firîye ber esmana..**

**.... Dane ber pestala.. Pestal.. Pestal...**

**Serê xwe bilind kire wan navçavên dozexî,agir jê dibarî,xün şüna xwehê bienîya wîve sor dikir.**

**- bibure, min bûyax nîne.**

**- çi..?Dê zü heker dê serê te dibin vê pestalê ve herşînim.**

**Bidestên recivik ve hêdî hêdî ew pestala genî paqij kir.**

**Xodanê pestalê lipişt xwe zifirî,rikeheka kewî ji wê tormbêla leşkerî îna der,dana ber sindûqa ü ya bûyaxê.**

**- here hindek ava tezî bû kewê min bîne..!**

**Çavên wî biwê rikehê ketin müyên leşê ü tîj bûn. çav diserî da zîq bûn..**

**- te ev rikehe ü ev kewe jikîve înayne?!**

**- ew ne karê te ye,here wek min gûtî,hindek ava tezî bû kewê min bîne û bes baxive..!**

**- eve kewê mine..!Eve şînûye,bapîrê min yê daye min,te ji kîve înaye..?!**

**- haa..Dîyare ew rîhdirêjê pîs bapîrê tebû..?**

**- tû pîsî,bapîrê min ne pîse..!**

**- çi..?Hey sey bab..**

**- tû hizar cara sey babî..**

**- wey..?Tû welê hatî diber min ra biaxivî..?Ka min çi libapîrê te kir..!Dê xirabtir lite kim..**

**Berî pistûya ü bigirt û jiaxê bilind bikit,memo darek ji rikeha kewî kêşa der.Şînü derket ü beref çîyay firî..**

*********

**- navê te..?**

**- memo**

**- jiyê te..?**

**- niza..!**

**- çewa tû nizanî..?**

**- dayka min dibêjit,tû yê beyana yazdey adarêy.**

**– çi..?**

**Serê xwe şorkir,tilên xwe hijmartin.**

**Memo berî wî hijmartin, gût:**

**- şazde**

**- karê te..?**

**- sipêdê xwandin,êvarî bûyaxa pêlava.**

**- tû çi karên dî nakî..?**

**- hindek cara ez û hevalê xwe şêrku çayxana Elû dişûn,car jî xwaringeha mihûy..**
**- bê mejî,ne karên wesa..!**

**- pa karên çewa..?**

**- te gût hevalê min şêrkû..!**

**- erê,ew baştirîn hevalê mine.**

**- tû û hevalê xwe şêrku diçine gondê bapîrê te..?**
**- ne..Ez bitinê digel dayka xwe diçim.**

**- tû direwa di kî..!**

**-...**

**- rastyê nêje,heker dê te ser jê kim..**

**- tinê carekê şêrku digel me hatibû..**

**- hatibû çi..?**

**- demê bapîrê min kew daye min,min gûtê,min kewekê hey,ü divîya kewê min bibînit.**

**- te bû kewê xwe ne diîna mala xwe?**

**- kew hez jibajêra nakin.**

**- ka babê te?**

**- babê min şehîde..**

**- şehîd..?Tû kurê şehîdî..?**

**- erê**

**- bibure me çi agehdarî jivê çendê nîne,babê te likîrê şehîd bûye?**

**- liçîya**

**- digel kê bû..?**

- pêşmerge bû
hizar tep ü mst ü darü dûq,wek tevîyeka gijlûkê liser serî barîn.

- ew ne şehîde..Ew dûjminê welatîye,ew xayne..

-...

- tû her çend roja carekê diçî ye gûndî?

-...

- heker tû rastyê ne bêjî dê bişeq bêjî..

-...

- te çewa xeber gûtine wî efserê hind mezin ü biha giran?Ma tû nizanî ew ser leşkerê vê deverê hemyê ye?

- wî xeber gûtine min,ü kewê min dizî bû..!

Dîsan liser serî bû tevîya gijlûkê..

Hewarên wî tijî wê kelihê bûn,ew girtyên berî ü liwê kelihê bûyne mêvan,ji xewên giran hişîyar bûn, zanîn hêşta şureş ya likare,hêşta ew ne hatîne jibîr kirin.

- şêrku kîye..? Bû min behsê wî bike..

- hevalê mine,nihu dewata wîye,dê ev şeve bite zava..

Kenîyeka kirêt jiwî devê reş derket.

- dê bite zava...?Xêrê jê nebînit...!

- 4 -

- navê te?

- şêrku

- jîyê te?

- hejde sal

- karê te?

- sipêdê xwandin,û êvarî amana bû xwaringehê dişom.

- dê rastyê bêjî,yan wek hevalê te memo hema te livêrê serjê bikin?

- hewe çi divêt?Min ageh jiçi nîne?!

**- memo hemü tişt bûme gûtîne,hema tûjî rastyê bêje da me ne wastînî ü em jî te ne êşînin.**

**- rastîya çi?!**

**- te û memo belavok jigondê bapîrê wî diînan ü linav bajêrî belav dikirin.**

**- nexêr we nîne,ez çucara neçûyme gondê wan.**

**- direwa neke,tû yê çûy,memoy gût digel min hatibû.**

**- tinê carekê û em zü zifirîn.**

**- hewe çidigel xwe îna?**

**- mast ü penîr ü hindek hêk..**

**Wek gorgên birisî berê xwe dane êk,agir jinav çavên wan dipeşî..**

**- eve hûsa nabit,em neşên demê xwe digel te biburînin.**

**Kaxezeka sipî dana ber sîngî û qelemek kire didesitî da ü gût:**

**- li vêrê îmza bike.**

**- çu nivêsîn nîne ez libin îmza bikim..?!**

**- îmza bike,nivêsîn xema me ye.**

**- lê..?**

**- dê îmza kî..?Yan tilên te bibirim û ez pê îmza bikim..?!**

**- ne,xwe ture neke,iha eve îmza.Heker te bivêt dê sed cara îmza kim?**

**- nene,ev îmzaye bese bû serê te.**

**Dengê zirnayê diserî da hizar awaz vedidan,tilîlyên dewatîya digel dest qutana heval û biradera esman kun kirin.**

**Her govend berfireh dibû,her pirsîyar liser serê ü zêde dibûn.**

**Birazavay milê ü girt.devê xwe bire bin gohê wî:**

********

**- tû dizanî dê çi kî?**

**- erê, ez dizanim..**

********

**- tû dizanî sizayê te sêdareye?**

**– min çu nekirîye,da sizayê min sêdare bit.**

********

**– xwe zîrek ke,netirse,ew jina teye û hevjîya teye.**

**– erê, raste.**

********

**– rastyê bêje,te çend karên dujminayetî dijî şoreşê û hukmetê kirîne?**

**– min çi nekirîye,û ez çi nizanim.**

********

**Bira zavay dergeh vekir,kete beramberî wê bejna zirava gelek hîvî diçavên wê da didîtin.**

**Berî birazava derkevit,berî destê wê yara gelek sala libenda wê may ü xewnên rengîn,şevên wî dikirine rojên geş.**

**Seqata dergehê zîndana wî hate girtin,ew birazavayê înaye wê zîndanê lidur teniştên wî hate çepa..**

**– te em gelek wastandin.**

**– min hemü tişt gûtin,min bû hewe liser kaxezeka sipî îmza kir,ma hewe çi dî divêt..?**

**Jiber dengê dehul ü zirna ageh jiçi nema,diber bejna zirav da nivist.dixeweka kür da berzebû..**

**– hîvyên me bicih hatin!**

**– erê,lê eve ne dawya hîvyên mine!**

**– te çi hîvyên dî mayne?!**

**– welat.. Azadî.. Dadwerî...**

**– ew hîvyên me hemüyane.**

**– hîvyên milletekê hejar û bê xudan..**

**– mala te,dê hema ev şeve behsê welat û azadî ü şer dujmina neke.Ma dê dunîya xirap bit,nê her careka bidizîve me êk didît,berî tû lêvên min biramosî,te hizar cara xwe gurî welat ü azadiyê dikir. Bila ev şeve bû min bit,bû min bitinê,çi heval û heüiya dibükanîya min da limin ne ke bela...**
**– welat..Kurdistan dê her mînin evîna min ya êkê û tû ya duwêy,lê evîna her êk jihewe ya ser bixweye..**

**- heker min bawer nekirba,evînî bidabeşkirinê zêde dibit,ez da jidil ture bim,û heker min jite pitir welat nevîya ba,ez da xwe kujim.Lê ez nizanim wek te ciwan van peyva bibejna welatî bêjim...**

**- nê min tû biwan peyva xapandî ü kirîye didilê xwe da, ma ne weye?**

**- erê, peyvên te yên dil helîn,ez kirim êxsîrê van çava..**
**berze bûn dinav lêvên êkda,çûne dunîyayeka bê şer ü şoreş.dunîya bibû baxçeka mezin ü rengîn.**

**Wek dû pelatînka gol bû golê maç dikirin,tûvê hîvyên xwe dinav dilê êkda çandin,dil aviz bûn,hîvî zan,dengê pale ü hejara tijî kulana bûn,stiran ü sirûdên nîştîmanî liser cada bilind bûn,girtîxane hatine şkandin,girtî azad bûn,sirûda eyreqîb jiwê kasêta dibin Balîvkê wî ve bilind bû.**

**Biçük jin,tulaz,pîr ü kal ketin ser cada,berev baregayên leşkerê faşista çûn,agir berdane ala mirov xwera,tanik ü tûp peqandin,welat jitarî persta paqij kirin,destê êk girtin ü kirine dîlan..**
**- hilû seybab,ma eve hutêle?Tû hatî binivî?**

**Hilû zübe berî min bikeve...!**

**- dê min kîve bî..?Dê çi limin kin..?**

**- dê te bine ser cihê te..Ma tû ne zavay..?Ha ha ha.**

**Heker dijîyana mirovî da,carekê xewin biban rastî, mirov da her mînnit nivistî,da xewnên bidilê xwe dîtiban,û da ew xewna wî divîya kite rastî.**

**Lê ne xewin dibine rastî, ü ne rastî binivistinê dibine rastî.**

**Hemü hîvî bixebatê berî digirin,û dibine rastî.**

**Berev bindaveka tarî bire xwar,dirê da wek kutana pezî,robotên bê dil,diraçandî ne,her robotekê digehiştê,baca xwe jilêdanê didayê,her wekü gorgekê pîr ketîye dinav destên şivana.**

**Libindavê,hindek seroçavên kirêt libenda wî bûn.**

**- dê were, em lihîvîya tene.**

**Ew gîyanê dinav rehên dilê ü da may jitirsa revî ü berze bû..**

**Çavên ü vekirin, dinîva xwe da berdan,her êk wek hirçeka çîyay xün jididana dibarî.**

**Çavên xwe perxandin,berê xwe da wî cihî.**

**Dîwar hemü dixünê werbûyne,bêhna xünê tijî difina bû,lirexên wî hemü mirovên didan jehrin.!**

**- tû vê xünê dibînî?**

**Berê xwe jicihê xünê guhast.**

**- eve xüna hevalê te memoye..**

**Çav diserda zîq bûn.**

– heker tû bawer nekî,eve ew pirtên jikelexê wî mayn divê qûlaça tarîve!

Destekê reş kumeka hestên dinav şelekê reşda havêtine ber pên wî.

– eve şelê memoye!Eve şelê memoye!

– erê,em jî we dibêjin,eve şelê memoye.

– ka memo?!

Biserê pêlava xwe kiluxkê wî yê biçük girêl kire nîva bindavê.

Neşîya xwe liser pêya bigirt,dilê wî hate girtin,çavên wî ew dîmen qebül nekirin,dinîya lipêş çava şêlî bû, tarî bû,dizifrokeka dijwarda jorda kete ser hestiyên hevalê xwe memo.

– 5 –

Seruçavên xwe jinav wê pirça xena kirî înane der, textê xwe yê bûkanyê vala dît,tijî rexên wê mirovin.

Şüna tilîlî ü destqotanê, girî û rondikin.

Kesê pîrozbahîya wê nekir,kes linîva jora wê ne leyîzî,

Kesê (bükê hey narê bû ne gût).

Patê nîşana kiçînîya wê ma veşartî.xena bidestave lipêş çava reş dîyar dikir.

Pist pista pîrejina mejî lê hêra.

****

– xêr jê nedît.

– serêwî xwar.

– pê wê neyê xêrê bû.

– eve çi kêvrîşka beş bû hatîye divê malê da....?

****

Careka dî biwan sîlavên pirça xwe,çavên xwe yên tijî kil û rondik veşartin,ü cu dixilweyîya xweya berê da.

********

**– tû dizanî,pirça te min dibite sîlava?Ez jê têr nabim, gelek cara min digût,xuzî ez şeyekê darî bam ü ketibam didestên teda,û te ev pirçe pê şe kirbaye!**

**– pirça min hind liber dilê te ya ciwane?!**

**Tilên xwe kirine şe û dinav pêlên şirînên pirça wê da birine xwar.**

**– erê..Bû min nan û av bûn,bû min jîyan û kar bûn.**

**– pa heker te tiştekê xuştir dîtiba,tû da çi kî....?!**

**– tiştê çi..?!**

**Bendojka sîngê xwe vekir ü nîv rüs kir û her zü veşart.**

**– eha eve..**

**Digel kenîyeka mê,her duwa xwe havête êk.liser wî gîyayê buharî ketin dişerê evîneka dijwarda.**

**– hişîyar be min nexoy!**

**– rojê hizar cara te bixom,ez jite têr nabim.**

**– husa bû me naçite serî,were min bixwaze,bila devê neheza bête girtin.**

**– hemü dizanin tû ya minî ü ez yê teme.**

**– erê, belê bike rastî.**

**– bila, soz bit divan rojada.**

**Bê dengyê biser da girt,her êk çû didinîya xweya taybet da.**

**– her wekü pirça min û.. ü... ü...**

**– û.. ü çi?!**

**Kenîya ü evîn jê dibarî.**

**– ez na bêjim..**

**– tû dê bêjê yan te bixûm?**

**– min divîya bêjim..**

**– dê bêje, tedilê min heland..!**

**– pirça min û sîngê min,tû ji evîna te ya mezin dizî..?!**

**Rast rabû ser pîya.**

**– çu tişt neşên min ji wê evînê bidizin,ew ne tinê evîne.Ew man ü jîn û paşeroje.Ew her ya liberahîya min,mana min jibû wêye.....**

Her wekü cerekê ava tezî biserî da kirî.Rast rabû ser xwe,dinîva wan mirovada bû gilç!

- şêrku.. Şêrku,bu min şêrku bînin,bu min şêrku bînin...

Dû sê pîrejina milên wê girtin û birex xweve cihê wê kirin.

- dê êt,kiça min dê êt,ma çi kirîye?Xudê dê her parêzit.

Hemü jixewa giran ü jinav hizrêt kür,kêşane wê kumbuna Ne rêkxistî ü bê jivan.

Giryê hind ji berze bûnê rizgar kirin, axînka hind kirine êxsîrên rondikên kel.

- her kesê van dujmina girt,berdana wî nîne.

- hişbe...bila kesê goh lite ne bit,dilê wan bi xwe yê birîndare.

- hejarî...Ne hêlan bizavatîya xwe şahî bibit.

Gûtin ü axînik û kelegirîya dayka şêrku û ya xüşkên wî diserê wan da wek şêrekê birîndare.kiluxkê wan didite ber leq û penca.

Dîwarên mejyê wan çi nemaye dê ji cih çin,çi nemaye ,dê mijyê wan ron bit,jorda digoh û difina da bite sirrik.

Çavên wê jirondika zûha bûn,bînahîya çava her şêlî dibit,gewrya wê her ya hişik dibit.

Ev vîstevala têkel jidawetîya.ewên xwe biciwantirîn cilik xemilandîn ü hatîne ser subehîya wê.û ewên biwan ser ü dila ve zifirîn malên xwe û xemla xwe guhartîn û careka dî hatîn ü beşdarî dixemên wê dikin.

Rengê vîstevalê şêlî ye,kes nizanit dê çi kit?!Dê çi bêjitê?!

Xüşka wî ya mezin,her jikulanê bû tilîlîya wê û bidewat leyîzuk ve qesta nîva hewşê kir....

Tilîlyên wê digel hewar û qêrîyên xüşka biçük têkel bûn.Dîmen serubin guhart.!

Dîyarên heval ü kes ü kara,man dipaxlên wan da, hemü man hilawîstî,kes nizanit eve çi bû,û dawiya vê vîstevalê çîye.....?!

Kes neşêt çi pirsîyara bikit,kes neşêt çi harîkaryê bikit.

Hemü yên lihîvîya firyê gay,hemü yên lihîvyê esman bizêt û pêxemberek jê bibit û litana wan bêt.

****

- mirovê bê welat,yê bê bihaye,çi tam û xuşî ji jîyana xwe na bînit.Çend yê ciwan bit,çend yê zîrek bit,çend yê zengîn bit,çi xuşyê nabînit,çi hest biserketina nakit,lewra hemü xuşî,û hemü serketin gorî bihosteka axa rizgara welatekî bin.aaax welat!

- raste,lê welat ne liser milên te bitinê ye,te xwe bi kula kuşt.....!

- kî dibêjit ez bitinê me?!Li bin her berekî,libin her dareka Kurdistanê,gûrê şehîdekîye...!

- mala te pêtivî teye,ez pêtivî teme,tû bû me hemüya gelekî,me kes nîne jibilî te.

- hizarên wekü min.gorî rojeka azada vî welatî bin...!

***

Hewara wê dîsan hemü înane ser hişên wan.

Serê xwe yê giran da ber tep û mista,ew pirça rojê sê çar cara jiber xatira wî şe û reng dikir.veçirî,wek hirîya şe kirî lê hat.

Lidur xwe zifirî,divîya xwe pavête nav agirekî da, xwe bidite ber xencera,divîya zü ji wî deravî derkevit çi bibit bila bibit.

Lirexê dîyê malê,babê wî yê dinîva zelama da.serê xwe yê dinav dersoka xweda veşartî.deng û livîn jê naên.Tijî rexên ü mirovin.

Bidengekê nizim, piştî dû sê cara li dûr xwe zifirî:

- dibêjin gondên lipişt çîyay hemü yên sotîn,û her kesê ketîye destên wan,yên kuştîn.....!

- erê raste,malê wan hemü jorda bire xwarê.

- malê dinîyayê çi nîne,gîyan,namus,welat.....

- hiş,..hişbe,dengê xwe bilind neke.

- erê bawerî nemaye,mirov neşêt linik biçükên xwe jî biaxivit.

Milê xwe bimilê hevalê xwe ve şidand:

- min guh lê bû,dibêjin memo yê tifal yê bieşkencê kuştî !

- ew çewa...?!Kê gûtete?

- moxtarî,ew hevalê wane,gelek tişta dizanit!

- heyla hejarî,ewjî birêya babê xwe çû.

- bila kes nezanit.

- başe....

- tû dizanî ,memo şêrku da girtin?!

- ne ne..!Wekü bira bûn!

- erê wekü bira bûn,lê hindî qotan û hindî êşandin, xwe liber negirt,navê ü aşkira kir.

- aşkira kir..?!Mayê berzebû..?

- dibêjin!herdû rêkxistyên navxoy bûn!

- ev biçûke....?!

- erê,pa sera çi hatîne girtin....?

**Germatîya dîwana wan bisilava hindek mêvana sar bû.**

**Hemü yên mayne hilawîstî,nizanin çi bikin,nizanin çi pêjin.**

**Bêhna zirna bêjî teng bû,tiv kire wan parên liser babê zavay mayn.zirna xwe kire diber şûytika xwe ra û derket.**

**Tulazên keyvî,verevîn,ew evîndarên libenda yarên xwe,digera govendê da tilên wan bigezînin,bêhîvî bûn,man lihîvîya delîveka dî..**

**Şûna lewendiyên sor û zer,eba reşa dîwana xwe girêdan.**

**Kenî bû girî,dest qotan bûn sîng qotan,tilîlî bûn zêmar.**

**Kes dikesê nagehit,kes nizanit dê çi rû dit?!**

**Qêryên dayka memo,hemü hêr kirin.biherdû desta serê xwe diveçirî,sîngê xwe dida ber mista .**

**qesta nîva kuma jina kir.**

**Hemü wek mirîdên Şêxekê dîndar,jipêşve rabûn ü qesta wê kirin,linîva hewşê gehiştin êk.**

**Hewar ü qêryên wan esman kun kirin,hemü pêkve dihal çûn.....**

**– 6 –**

**Gorepana şerî,bindaveka sar û tarîye.Dûjmin gorgên harin,Dirindene,tarî perêsin.**

**Çekên wan,hemü rengên eşkencê ne.**

**Xûdê,wan nabînit,wijdana wan ya ker ü kureye.dil asine,xün jehre,mejî lihizar muxlan vavêr kirîye ü bi hostayî carekadî darêştîne kiluxkên serê wan.**

**Baweryê biçi xudaya naînin,çi peykera na perêsin jiblî peykerê reş.**

**Çi lave ü ayata na xünin jiblî ayata "el,enfal..!"**

**Çi heval nînin,çi mal nînin,ci welat nîne.**

**Ferman jibilindahîya esmana bû dibarin.**

**Wek robota karê xwe dikin,kes nawastit,kes birsî nabit,kes xwe nerazî nakit,kes na tirist.**

**Tiris tinê jipeykerê reşe,birîyar tinê ya wîye,her kesê ew jê razî nebû,dê kite birmît û hilkêşte kiteka difina xwe û digel kilmîşî havête bin pên xwe.**

**Şer berdewame,wek terazîya bazirganekê diz,bi alîyekî da şore!**

**Wek şemamukeka gehiştî,dinav destên hindek biçükên şüm da,yarîya pê dikin,li vî dîwar ü lidîwarê he didin.**

**– navê hevalên xwe bêje**

**–...**

**– hün çend kesin?**

**–...**

**–.. Hewe çi libere?**

**–...**

**Dijwarîya wan,dirindatîya wan,didanên wan yên xün jê dibarî.**

**Her ü her dijwar di bûn.**

**Leşê wî yê nazik ü bê desthelat,her xav ü bê hêz dibû.**

**Di navbera Dijwarîya wan ü bê hêzîya wî.gehşte pileya xwe jibîr kirinê....!**

**Dîlan germe,dewatî yên serê xwe dixûn.zava birex Bükêve roniştîye.tilîlî û destqotane,dehol ü zirnê hemü yên hêr û bê nivêj kirîn.**

**Memo linîva dîlanê wek meymünka biwê destmala dutmama ü kirîye didestî da dileyîzit.**

**Car jî yê avê ü cgara linav mêvanên dewatê digêrt.Car care mayê xwe diwan jina dikit.ewên karê xwarinê dikin bû dewatîya.**

**Lê her çendekê linîva dîlanê û liberamberî hevalê xwe liser pêyekî wek leîyzuka espanîya dileîyzit.**

**Her dehol qot yê pîstê deholê didite ber doqçika, her govend ya dişaryêt.her xweh û xün ya têkel dibit.her leşê wî yê nazik,wek deholê yê diête qotan.....!**
**jihemü hesta bû,ageh jiçi nema,ew birînên xün jê dizêt,bûn kanyên aveka zelal jilatên çîyayekê bilind jorda hatine xwar,ew hestiyên nazik dinav pîstê wî da,wek nanê sêlê diçantikê şivanekê aşiq da.bûne hirüşk.**

**Liser hemü Dijwarîya şerê êk layen,liser wê dirindatîya şervana.**

**Neşîyan dêmê dutmama wî jipêş çava bibin, neşîyan kenîya wê,çavên wê,pêlên pirça wê.jipêş çava berzekin...!**

**– tû gelek berê xwe didîye min,te xêre?.**

**– ha..? Çine, çine.**

**– ne ne, bêje, şerim neke.!**

**– ê.. ê..!**

**– ez yê lihîvîya axiftina piştî, ê, ê..**

**Bişkurî,kenî...çavên xwe yên reş veşartin,pişta xwe dayê.**

- dîyare tiştek yê dibin vê şerimê ve hey.....?!

- erê..

- dê bêje,heker ew dîyarîya min bûte înay,na dime te!

- dîyarîya çi?Ka nîşa min bide?!

- heta tû ne bêjî, tû nabînî..

- ez şerim dikim bêjim.

- şerim dikî?!

- erê.

- pa te dîyarî ne dît.

- dê bêjim,dê bêjim..

- dê bêje…

Serê xwe şûr kir,yarî bitilên destên xwe kirin,rûyên wê sor bûn.

- babê min gûte dayka min..

- ê? Çi gûtê?!

- ez nabêjim..

Destê xwe da berüka şelê xwe,tiştek jê îna der, nehêla bizanit çîye.

- tû vê nabî,heker nebêjî?

- gûte dayka min..

- ê...?

- bila bes xwazgînî bên.

- xwazgînî....?!

- erê, rojê sed diên.!

- û paşî?!

- gût, gût kiça min bû, bû..

- gût bû kêye?!

- ez nabêjim..

Revî û tilîlyên kenyê wek pelatînka lidüv xwe reşandin..

Liber dîwarê mala wan gehiştin êk.

- tû bixûdêkî Mamê min we gût?!

– erê, erê wegût.

– û dayka te çi gût?!

– dayka min jî razî ye.

– ez bawer nakim?!

– bawer bike,eve rastîye,lê divêt tû xwe zîrek bikî,zü xwandina xwe bidawî bînî..

– xwandina min ne astenge...pare,desttengî,nextê te,zêr..

– ne,xema van tişta nexû,babê min ew hemü çareser kirîne..

– ew çewa?!

– erê,gût birazayê min kurekê başe,me çi jê nevêt, tinê xudan kirina kiça me û dayka xwe.

– ez dê te û dayka xwe bixüna dilê xwe xûdan kim.

Dengê deholê her bilind bû,dîlan her gerim bû,şer gerim bû,şervan na wastyên....!

– divêt eve jivê bindavê dernekevit.

– ma dê jinü derkevit?

– raste,jiyê wê biçüke,na ête dad kirin!

– dad kirina wî dê livêrê kin.

– ma eve ne dad kirine....?

– divêt ne derkevit.!

– ne ne, heker der ket,dê dinav şelê wî da bite komeka hestîya.

– heker pirsîyar kirin,em çi jê nizanin.

– me ageh jê nîne.

– nihu gera hevalê wîye.

Birîyar hate dan,kombun verevî,dîlan bidawî hat, zava jibûkê dizîn...

– 7 –

Karê leşkerî bidawî hat,encam gelek diserketî bûn.

Şopa wan xwyaye,bêhna xünê tijî esmanaye, ewrên reş lihindav çîya barana jehrê dibarînit.

**Gond hemü kavil kirin,kanyên zelal dagirtin ü jehr kirin,rê û pir birîn,dar ü şînkatî agir berdanê,nêr ser jê kirin,mê kirine (sebaya).landik digel xwe birin..**

**- erê,erê "enfale",serê wan,malê wan,kiçên wan bû me helalin.**

**- Her tiştê hün bikin,hün diazadin....!**

**Gûhên çîhanê tijî qîre,çavên wan tijî kinîşte,hest biçi nakin,dixeweka giranda diberzene....!**

**Piştî ber nemaye liser berî,piştî lipêş çavên wî yên tarî,pîrejina wî liber pestala bin ax kirîn,piştî hespê wî, kewê wî,pezê wî,cilnivêjika wî lizîleka leşkerî kirîn.**

**Berî ser leşker bidemanca xwe xatira xwe jê bixwazit.**

**Dest da gopalê xwe û lipêşîya wan rawestîya ü karê şerî kir.**

**Rikeha kewê nevyê xwe lipişt xwe veşart.**

**Silava ser leşkerî berxudana wî bidaü îna.**

**Liketinê,hêşta çavên wî şer dikirin,didanên wî yên nîv nîve,berxwedan dikirin,tilên wî bibûn lülüyên kilaşînkufan.....**

**Tinê çava zanê çirodaye?!Tinê çava hemü livîn tumar kirin,û êkser bû nevyê xwe digel tîşkên rojê hinartin ü tena nivîst.**

**Yê lihîvîya tol vekirinê.....!**

**Berî agir jikavlên gûndî vemirit,berî xüna wan tolaza sar bibit.wî divîya tol bête vekirin,wek gelek cara, divîya destkevtên wan ne gehine binecihê.**

**Karwanê wan bidest qotan û tilîlî jorda çû xwarê. Paxlên wan tijî dîyarîne,ala wan bilinde,serketin rêya wane,destkevt armanca wane.**

**Çi bibit bila bibit,çi rûy dit bila rûy dit.tinê alifê wan gûşt ü xûyn bit,tinê peykerê reş jiwan razî bit,bila dinîya û xudê her jê ne razî bin....!!**

**Hêşta dengê sotina dar ü barî tijî wî gelîye,hêşta xün ya jibirînên kel dibart û digel ava kanyên zelal têkel dibit,**

**Hêşta şûn pestalên wan dixoya ne.**

**Çend tolazên ber biagirê tarî persta neketîn,milên xwe dane êk,carekadî gond ava kirin,tuvê hîvî ü jîyanê liserê çîya çandin.**

**Kelexên şehîda rêz kirin,birîndar nînin,her tiştê livî dane ber agirê çekên xwe.**

**Kelexê bapîrê memo,dahêlan gorekê teng, dinavbera dû bera da.**

**Tilên wî hêşta şer dikirin,çavên wî hêşta,berevanî ji gondî dikirin,gopalê wî hêşta yê sax bû....!**

**Bêy nivêja mirîya,bêy xwandina ayata,bêy bikifnê sipî bixemlînin,berdane gorê sar!**

**Lê ew yê saxe,digel wan dijît,hest bihemü tişta dikit, beşdaryê dixuşî ü nexuşyên wan da dikit.**

Piştî tijî ser kelexê wî ax ü gîya kirîn ü çûyn.

Ewjî rast rabû ser xwe,serê ü biçi helana neket,

(inkîr û minkîra) neşîya dinav gorî da asê bikin.

Yê bûye (xizil) pêxember,lidinîyayê digert,diçite destê çaka,dibite hevalê hejara,xwe nîşa aşiq û evîndara didit,xwe dikite reşe bû dil reşa.....!

– 8 –

Liwî cihê lê bûye ferx,liwî cihê şün dimên maka wî lê dîyar,liwê xîzgevizka gelek cara digel têşkewka yarî dikirin.Liser berekê mezin rawestîya û berê xwe da gondî..

Gond yê kavle,bêhna jîyanê jê naêt,kuz ya sotîye, kanîya gondî ya hinîye,ew betenka digel maka xwe lê diçerî,agir yê pêve.

Divîya biqebit,çavê wî bigorstana gondî ket,ewa deh cara jigondî mazintir lê hatî.

Hindek gorên nü dixweya ne,firî liser kelutka gorê bapîrê memo dada û jidil qebî...

Bersiva wî ji wê lata beramberî gondî hate dan. kete digel reva hevala,ew lat xemilandin.

Careka dî biniklên xwe hêlîn dibin helana dirust kirin. Careka dî buhar çerandin.Careka dî hêk kirin,ferxik lidûf xwe birine çerê û pêkve qebîn...!

– 9 –

Yê bibanê bindaveka teng û tarî ve jorda berdaye xwarê.

Pên wî hişk bibanê bindavêve girêdayne,serê wî çend bihosteka ji axê bilinde.

Jor tarîye,bê dengîye,ne nan ü ne ave.tinê her çendekê fireka bay xwe dihilkêşte devê wî yê xunelû.

Çend endamên dinav leşê wî da yên ligeorîya wî kom bûyn.

Ew çend firên firşkê dayka wî liroja bûna wî daynê, nihu çip çipe jidifna wî dibart.

Yê hatîye jibîr kirin,kes pirsîyara wî nakit,mêvan dizorin.

Wek pezê didestê serbirî da.dema bibanê dikana xwe ve jorda dihilawîst,û kevil dikit,dihêlte wesa da xüna pîs jê bête xwarê..

**Çi teratî dileşê da nemaye,çend carekê hişên wî diêne serî,dikite hewar û dikite gazî.Kes ditana wî na êt.**

**Hizra bire rojên bihara.demê digel hevala diçûn gorstana pişta mala,werîsên xwe dihavêtine wê dara tuyê,ewa libin serê wî gorê kes nizanit yê kê ye.Û hemü jê ditirsin,ayata liser dixünin....!**

**Hêzkeka biçük çê dikirin,piştî jê têr dibûn,dibû gera kiçan.**

**Wan kiçên hevalên xwe didadan ü diketin sohbet û keyfê.**

**Demê destên xwe dihavêtine kemaxên wan û didaneber pala û bilind dikirin,kirasên wan digel bay bilind dibûn,çavên wî biwan ranên sipî diketin, dilê wî xwe zêde diqota.**

**Ew dîmen gelek şeva jipêş çavên wî ne diçû,gelek cara şeytanî xwe dikire ew kiç û dihate dîwana wî, heta sipêdê liber bejna wî dinivîst.**

**Dengê dergehê bindavê şeytan revand.Ew şiftana didesitî da likelexê wî weşand:**

**- tû hêşta yê saxî?!**

**Hewara wî ne gehişte çi gûha.**

**- me sûza day,tû hosa bimirî,em çi fîşeka lite xerc nekin.**

**Destê xwe havête pirça wî ü kêşa,heta ber dergehî û berda,wek hêzkê linîva bindava tarî hat û çû.**

**- heker tû mirî,yan te bivêt bimirî,bêje min..Bila? Ha.. ha..ha..**

**Dergeh careka dî hate girtin,carekadî jidinîyayê hemüyê dür ket.**

**Çend carekê kelexê wî yê nîv mirî ji vî rexê bindavê diçû rexê dî,hîvyên wî lawaz dibûn,bawerîya wî sist dibû,wek sisitîya gehên leşê wî.**

**Liser wê taryê ra,liser wê tengatîya cihî ra.**

**dengê babê wî digehişt goha.**

**- divêt em jiwan bihêztir bin,divêt em jiwan netirsin, divêt em xwe ragirin....**

**Leşê wî hişik dibû,giran dibû.**

**Dengê babê wî dîsan dihat..**

**- her dema me xwe jibîr kir,me xwe sist kir.em dê kevin bin pîya..Hişîyar bin,hişîyar bin..**

**Xwe ragirin...!**

**- 10 -**

Birîyar hate dan,bizütirîn dem tola memo bête vekirin.

Biruska nihênî liser hêzên pêşmerga hate belav kirin.

Kum bûn,civîyan,xwe amade kirin,cih ü dem hatine helbijartin.

- divêt dilê dojminî bête herşandin,divêt em nehêlin dojmin bivan kara şad bit.Da tolazên me bê omêd nebin.

Pila xwe amadekirinê gehişte lotka xwe gorî kirinê.

Digel rojê xwe nêzîkî cihê helbijartî kirin.

Roj her zer dibû,dilê wan geş dibû,dinîya tarî dibû, çavên wan ron dibûn.

Sirûda "eyşehîdan"digel awazên qotana dilên wan hêrişa wan dikire vîsteval.

Erd libin pên wan dihejîya,dar ü ber bibûn hevalên wan!
lirexê dî,barana tirsê wek tevyên buhara leşê leşkerê reş ter kirîye,mejyê wan jitirsa hişk bûye.xüna leşê wan ya şîn bûy,rengê pîstê wan gohartîye!

- dê her tola van kavle gonda vekin!Ez baş wan dinîyasim....!

- ya jitol vekirinê cûye der!Ya bû wan bûye man ü neman!

Xew revî,westîyan jibîrkirin,dilê wan yê wekî mişkekê jiber kitkê direvit.cih nîne xwe lê veşêrt.

Çik çika demjimêrê serê wan dixut,her çend çirkeyek jijiyê wan diçit,nêzîkî dawya jiyê xwe dibin.

Ew baş dizanin,paşeroja wan ya reşe,wek reşatîya wê şeva sar.

Tarî tijî çav ü devên wan bû,tirs bû hêrwîyn dinav xüna wan da azirî.cih nema xwe lê stare kin, mijülankên çavên wan lê bûne reşe!

Birs jibîr kirin,cilkên wan bûne giranî bû gîyanê wan. Hemü man lihîvîya teqîna fîşeka pêşyê..

- vêre dengê Kurdistana îraqêye,dengê şoreşa milletê kurde..

Mijde,mijde,evro berê sipêdê,pêşmergên qahreman,Dastaneka dêrîn tomar kirin,evro berê sipêdê,peyama tûl vekirina memo,sotina sedan gonda,gehişte dayka memo û daykên hemü şehîdên ser bilind,evro sipêdê parçeka mezin jiaxa pîroza Kurdistanê jixün mija hate paqij kirin,evro sipêdê pêşmergên Kurdistanê ser bidehan kusip û çeperên dojminî da çûne xwar,bisedan kelexên wan yên genî dicih da man.

Eve dê paşeroja dojminî bit.

Serketin ü serwerî bû kurd ü Kurdistanê,mirin û rûy reşî bû dojminan..

- vêre dengê durdistana îraqêye..

**(ey reqîb her mawe qewmî kurd zeman..)**

**Tilîlyên dayka memo,dinav gorstana "şaxkê" da bilind bûn.**

**Ew hestîyên dinav desta da,berdane xwarê û rondikên xwe bilêva lewendîya xwe zoha kirin û berê xwe da çîyay.**

**Ew hestî eve çend roje didite ber sîngê xwe,ew hestyên ew jî nizanit yên kê ne,ü ka biçi rengê şovênî xodanê wan gîyanê xwe jidest daye?**

**Ew hestyên bê xodan,kirine di wî gorê biçük da, ewê bi nûynukên xwe bû kolay,û baş veşartî ü kêlîyek bû dirist kir ü rabû ser pîya,hindî çavên wê didîtin,hemü komên axê ne,hemü gorên bê navin, hemü hestyên bê xodanin,çi kêlî liser nînin,çi kes naêne seredana wan,kes ayata liser na xünit.**

**Ew gorstana jibajêrî mezintir, lipêş çava bû volkana mirovan,hemü jigorên xwe hatine derê,hemü di rapêçay bûn,hemü bibûn pêşmerge,hemüya silav kirinê û pîrozbahîya tola memoy lê kirin,wek tîpeka leşkerî, qesta bilindahîya çîyay kirin.**

**Gorstan ma vala,kes lê nema, tinê hindek gonehbar,hewara wan diküratîya goran da dihate goha.**

**Ew kiçên bêbextî lê hatîye kirin û kirêt hatîne veşartin,qesta esmana kirin û çûne dîwana yezdanî...**

**–11–**

**Pişta xwe ya daye wî dîwarê serê wî bizikê esmanî ve!**

**Roj lihindav serî wek reşekê mîrîye,serê wî didite ber şivtanên tîjkên xwe.**

**Çavên wî ranabin.dinîyayê baş na bînit,gohên wî hêşta tijî xünin!**

**Didanên wê bahira pitir yên dinav berçêlka wî da kum bûyn.**

**Lêvên wermî,ezman çi hest ü tama nakit.**

**Eve pitir jişeş heyve rojê silav ne kirîye serê wî.**

**Xwe kirîye qormik,liber üwî dîwarî roniştîye.yê lihîvîya reşekekî bêt wek her roj waneka lêdanê biditê.**

**Kenîya dû tolaza,hizrên wî revandin,axivtina wan ya kurdî bû.**

**Serê xwe bilind kir,kete beramberî roja dijwar. çavên xwe liwê hewşa mezin gêran.hewş tijî mirove, cih nîne,her çendeka yên xwe dayne êk xemên xwe divehînin.**

**Gohên wi yên tijî xün,careka dî ew deng wergirtin, çavên wî yên tirsnuk lidüv dengî çûn.**

**– ez ne bitinê me...!Eve xelkê devera me ne....!**

**Her dû tolaz digel kumeka mirovên dî bûn.sohbeta wan ya germ bû.**

**Nevîya berê xwe jikuma wan ladit.**

**– hün dizanin evro jî kumeka mirova birin û kes jê ne zifirî.....?!**

**– ma heta evro êk zifirîye,heta ew bizifirin?!**

**Eve karê wane,piştî jiqotan û lêdana me têr dibin, me diînine vêrê bû çend rojeka,paşî her çendeka cûda dibine cihê sêdarê ü gûlle baran kirinê!**

**– pa ew dadgeh çi bû?Ew çend roj bûn em lihîvîya wê heta gera me hatî?**

**– dadgeha çi?Halê çi?Ew jî pêtiranke,wek jîyana wan.Wek şanûyeka sadebû,da xwe ne kine gonehbar bikujtina me.da bû wan wek belge û danpêdana bit,da bişên me biasayî bikujin!**

**Kenîyeka şermîn jidevê wî pîremêrê rîh dirêj derket:**

**– hemü tişt livî welatî biger ü dûrin,heta sêdarê jî...!**

**– erê,heker wesa nebit,heker biger ü dûr nebit,kî dê şêt van hemü mirovan bin ax kit?!**

**Berê hemüya kete wan kum kumên mirovan,ewên lihîvîya dûra xwe şir bûyn,her êk hesüdyê biwî hevalê berî ü diçit ü nazifirt dibit....!**

**Sîbera wî ya xül,wek diza kete nav kuma wan.**

**Hemü bê deng bûn.tirsê dîsan hizrên wan ser jê kirin.**

**Gelek cara reşekên mîrî xwe dinav wan da dikine heval û bira,da pitir pêzanîna jê bizanin.**

**Seruberê şêrku neyê reşekaye,bejna wî neya reşeka ne.**

**Dû sê ya pêkve milên wî girtin ü linîva xwe danane erdî.**

**Hemü bê deng bûn,hêbetî man.**

**– hün... Hün,kurdin..?**

**Çavên wî jitirsa leyîzuk dikirin,liser wê germa zêde, leşê wi direçifî..**

**Pitir jiduwa gûtin:**

**– erê em kurdin..!**

**Wî pîremêrê rîh dirêj,bilêva huçkê xwe nav çavên wî paqij kirin,kêşa binik xwe ve.**

**– ne tirse,em hemü kurdin û bab û birayên tene, netirse..**

**Dilê wî kêmtir xwe qota,şîya pitir çavên xwe vekit.**

**Sê çar desta,serê wî û milên wî perxandin:**

- jime dür nekeve,tû û êşan jêk xilas.netirse,dibit tû bêye berdan....!

- berdan?!

- erê.. Dê êye bedan..Yan...!

- ya çi....?!

Sê çareka enîya xwe lê kirine girê ü axiftina wî birîn

- yan çune...,seda sed,dê êye berdan.

Bê deng bûn.ewrekê tarî hemü dinav pêlên xweda berze kirin.Hind birine ber sîngê dayka.hind birine ber teniştên jina,hind digovenda yarên xwe da xav bûn.

Şêrku jiber dengê deholê neşêt çi hizra bikit:

- bira zava çû?

- erê,min bimêlaka beranî razî kir û gûtê here mala xwe,ev mêlake bûte ü ewa dijorve bû min....!

- ü.. Ez hêlam dinav destên teda...?

- tû jimin ditirsî?!

- pîçek..

- çend..?

- hindî serê derzîkê..

- nene,netirse,ez her ewim,ewê berî çend rojeka tû libin tûyê girtî û leqek lirûyê te day..

- nê iha ez jiwan leqa ditirsim...

- ev şeve,ez leqa nadanim...!

- pa dê çi kî...?!

- tû dizanî..

- ne..Ez nizanim.

- ev şeve,dê te kime didilê xweda bû heta heta..

- eve jileqa bitirs tire..!

- min leq didanane te,da bêye nîşan kirin ü kes te bû xwe ne bit.

- da bû te bimînim...?!

- erê..Da bû min bimînî.

Kenî bilind bû,bişkurîna lêvên wî dîyar bûn.serinca hevala kêşa..

- heval,me pirsîyara navê te nekir?

- ha..? Ez..Navê min şêrkuye.

Dengekî bihêbetî û hewar ve gût:

- şêrku..?!Tû hêşta yê saxî?!

Xwe havêtê,jierdî bilind kire dinav sîngê xweda.

Hevalên wî wek bînerên şanûgerîyeka kirêt,man lihîvîya peyvên wan.

- kuru şêrku..Me hemüya hizir dikir tû jî wek memo yê kuştî...?!

– çi..?!Memo kuştin?!

- ma tû nizanî...?!

- memo..Memoyê hevalê min kuştin?!

- bibure,min nezanî,ku tû hêşta nizanî!

- ey hewar.Memo...ew kiluxik û ew hestiyên nîşa min didan yên te bûn...?!Tû jî negehiştîye Mirada xwe...!

Hemü dîsan bê deng bûn.

- gelek cara digûtine min baxive,navên hevalên xwe bêje,heker dê wek memoy lite kim.

Min nedizanî yê kuştî,min digût,wan divêt min bitirsînin.

- erê..Memo kuştin,kes nizanit hestiyên wî likîve ne? Kes nizanit biçi rengê dirindatyê kuştin....?!

Çavên wî diserî da zil bûn.

- ez baş dizanim ew çewa mirova dikujin...!Ez wan baş dinîyasim...!

Memo biçük bû,neşîya xwe liber bigirt!

- kes neşêt xwe liber bigirt.Te çewa heta nihu xwe ragirtîye?

Berê xwe ne da xûdanê pirsîyarê,her hizra wî ma hilaüsitî:

- kî dibêjit,min xwe ragirtîye?!

- tû hêşta yê saxî...!

- kî dibêjit,ez yê saxim...?!

Hemü man aluz.dimerema wî ne gehiştin,çavên wan man linav çavên wî.

- her kesê bilivit,yan bixot ü vexot,û biaxivit....Ew yê saxe...?!Hûyn wesa hizir dikin...?!

- bibure,em dimerema te ne gehiştin...!

Cihê xwe xuş kir,berê wî kete wî pirta ewrê gewir lihindav wî dîwarê bilind.

- ez jirojên despêka girtina xwe yê mirî me,min ne hêze,ne berxwedane,ne hîvîye...!

- nene,xwe bê hîvî ne ke.

- lihîvîya çi bim?Bû çi bijîm?!

- te jibîra min bir,ez dê mizgînîyeka mezin dime te, da tû bû wê mizgînyê bijî...!

- mizgînî..?!Bibure,navê te lawîne,mane?

- erê,navê min lawîne,û min mizgînîyeka gelek xuş ya bû te hey...!

- min hest nemaye,ez neşêm xuşyê biçu tişta bibim!

- belê..,ev tişte jiher tiştekî xuştir û mezintire...!

Berê xwe da nav çavên wî,bişkujkên hîvîya serê xwe hildabûn,ma lihîvîya livîna lêvên wî yên dinava rîh û simbêla ra xwe veşartîn..

- jina teya bitişte...!

Cerekê ava tezî,leşê wî yê kel kezand...

- jina min...?!Tiştê çi...?!

- dê piştî çend heyvekên dî bîye bab..

Seruçavên wî tijî hîvî bûn,divîya bikenit,divîya bibişkurt,divîya bikite qêrî..

Birînên dev û lêva bîra wî îna,kenî hêla digewryê ra.

Lê enîya wî ü çavên wî gelek tişt gûtin.

- erê bawer bike,min bivan çava ya dîtî.û babê te gelek çara ew sûhbet dikir.

- babê min...?!Babê min yê çewa bû?

- barê wî gelek yê giran bû,lê piştî jina te ew hîvî linik peyda bûy,barê wî sist bûye.Her digût,eve şûyna şêrku pir bû...

Hizra jinav kuma wan dizî...

- te kur divên,yan kiç...?

- kiç û kur,kur û kiç..

Kenî bilind bû...

- anku te çar biçük divên,dû kur ü dû kiç!

- te çewa zanî?

- ez dayka wanim,divêt ez bizanim!

Kenî dîsan tijî dîwana wan bû....

Destekî jidîwana yara wî îna dîwana rastyê.

- şêrku..Bê hîvî nebe,ev mirove hemü wek tene,tû dibînî?Hemü yên bihîvîya dijîn....!

**Çavên wî jinav çavên xudanê axivtinê venabit.**

**- û tû?Tû livêrê çi dikî?Tû çewa hatîye girtin?**

**Kenî,kenîyeka şermîn,serê xwe hejand.**

**- ma ev mirove hemü çewa hatîne?**

**Baş cihê xwe xuş kir.dengê xwe nizim kir.**

**- pêşmerge yên bûyne agir,dilê dûjmnî sotin.**

**Gûhên hemüya bel bûn,xwe pitir nêzîkî wî kirin.**

**- û rêkxistinên nihênî tijî nav bajêra ne.**

**Biezmanê xwe lêvên xwe ter kirin.Çavên hemüya man zil lidevê wî.**

**- piştî tola memo û sotina gonda hatî ye vekirin...**

**- tola memo?!**

**- erê..!Tola memo çicar dûjmin jibîr nakit....!**

**Çavên wan pitir zîq bûn.**

**- birîyar hate dan,tola şêrku bête vekirin.**

**Müyên leşê wî tîj bûn.**

**– tola min....?!**

**- erê tola te.me wesa hizir dikir tû yê şehîd kirî.**

**- min hizir dikir,ez yê hatîme jibîr kirin...!**

**- kes jihevalên me ne hatîye jibîr kirin!**

**- ê...?!ü paşî?**

**- birîyar bû rêkxistinên nihênî hate dan,em tola te vekin..**

**Pitir xwe nêzîkî wî kir û ma lihîvîya devê wî.**
**- me karekê mezin encam da..Lê.. Lê..**

**- lê çi...?!**

**- hevalekê me hate girtin,û em jî dîyar kirin..**

**- tû digel rêkxistinên nihênî bûy?!**

**- eve çend sale.**

**- me nedizanî!**

**Raste,kesê nedizanî..**

**- û nuke?Dê çi lite kin?**

**- wek hewe hemüya....!**

**Hemü şir bûn,axivtin jikesê nehat,hemü ketin dipêlên hizra da.**

**Hizir jî newêrin xwe lihemü tuxîba bidin,hizir jî yên hatîne dax dan,hizir jî neşên jiwan dîwarên bilind ü sîm ü kahreb kirî derbaz bin..**

**Gorgên har ketin nav pêlên pezê sipî.tera bera kirin,her çendek dikutanekê da kum kirin.**

**Hemü yên jihizira şüştîn.hemü yên jihîvîya mêtîn. hemü yên libenda gera xwe,li benda maç kirina sêdarê..**

**Hindî mêvan dimişene,hindî bazara wan ya likare, gelek jiwan bisala dimînin liwê bendê,gelek dimirin û Mirada wan bicih naêt.bû geleka dibite kul û digel xwe dibine gorî.**

**Gorên wan ne wekü gorên mirîyane!(inkîr û minkîr)jî newêrin xwe nêzîkî gorên wan bikin....!**

**Gîyanê wan ne bidestê (îzraylî) diête standin,wek hemü mirîyan!**

**Gîyanê wan biherdû pên xwe diçite dîwana xudê...**

*****

**Vê carê ne ew cihe,vê carê ne ew kesin.Vê carê kes yarîya bigîyanê wî nakit.**

**Cih ron ü firehe,kete digel pireka mirovan,kes milên wî na girt û pirsîyara jê nakit.**

**Her êkî liber tenişta hevalê xwe cihek girt û xwe kire qormik,ü dinav pîstê xwe daberze bû.**

**Şêrku ma jipîyave,nezanî dê birex kêve rünit!Kesê ne gûtê keremke....!**

**Dengê girtina dergehî hat,reşek berze bûn,wesa ma lihindav serê wan.**

**Çavên xwe vekirin,bêhna xwe hilkêşan,livîn û gîyan kete zîndanê.**

**Dengekî gût:**

**- tû bû na ronî?**

**Êkî dî gût:**

**- te divêt xwarinê û vexwarinê jime bibirin sera te?!**

**Dengekê nerim gût:**

**- rone Mamû,were birex min ve.**

**Berê xwe da hevala ü gût:**

**- bira,ew yê nûye,jinü jibin erdî hatîye der,ew çi nizanit.Divêt em bêhna xwe lê fireh bikin.**

**Gelek denga gûtin:**

**- bibure law,were eve cihê me bû te.**

**Dengekî gût:**

**- em yên lihîvîya mirinê,bibure me dilê te hêla.**

**Xwe nêzîkî wî kir:**

**- li hîvîya mirinê?!**

**- erê..Ma tû nizanî?!**

**Tilên laün dinav rîhên WÎ yên dirêj ra yarî dikirin ü gût:**

**- nene,gohê xwe nedê,dibit piştî çend rojên dî me azad kin.**

**Çavên xwe linav pêlên taryê liWÎ tulazê ew gûtin kirîn neqandin ü xwe lê ture kir.**

**Ew tulazê diwê qolaça zîndanê da,ageh jisuhbeta wan nebû,jinav hizirên xwe derket:**

**- bawer bikin,yê me ribîte dikin,wek goşt firoşa, dema pezî berdidine ser gîya ü cehî,heta baş qelew dibin,başî serê wan dibirin....!**

**Çavên şêrku diserî da zîq bûn,berê xwe da nav çavên laün,ewê jihemüya pitir nêzîkî wî.**

**Jigehên enîya wî,jişerê tilên wî digel rîha...**

**zanî axivtina wan raste.**

**- bawer neke lawê min,ne tirse,xwe jihîvîya bê bar neke.**

**Kes nizanit ka em bû livêrê ne?!**

**Ewên axivtîn,gelek peşêman bûn,zifirîn dixilweyîya xwe da.**

**Zîndan ker bû,her wekü çi gîyandar têda nînin, gohên hemüyan şor bûn.kesê nevîya xwe rüreş bikit û suhbetê bikit.Hemü man lihîvîya devekî,da jiwê şiratîya têda derkevin?**

**Şêrku zanî hemü yên lihîvîya wî,serê xwe da ber serê wan û gût:**

**- mirin gelek xuştire jiewa berî ez bême vêrê.**

**Suhbet vebû,axivtin bû ger ü dur,geleka ne dihêla hevalê wî xema xwe bidirustî bigehînte hevala. gelek man lihîvîya gera xwe:**

**- rawestin,ev suhbete me hizar cara goh lê bûye.**

**Me divêt suhbeta mêvanê xwe bizanin!**

**Eve çende yê girtî?Likîve bû?Çi kirîye?Jiber çi girtîye?**

**Dê bûme jiserî heta binî bêje....!**

**Lawînî bersiva wî da:**

– suhbeta wî wek ya me hemüyane,sera welatê xwe hatîye girtin,û hün hemü dizanin ka çewa mirov digehite vî cihî?!

– erê,lê hindek qonax hene gelek digiring ü intîkene diwî karwanî da....!

Hevalekî gût:

– dibit wî hindek tişt dîtbin,me nedîtbin?Dibit hindek hevalên wî lipêş çavên wî hatibine kuştin,dibit hindek heval dîtibin,dibit gelek tişt rüy dabin,hema bila ew bixwe bû me bêjit.ka çi hatîye serê wî ü ka çi dîtîye?

Çavê hemüya ma lidevê şêrku,şêrku yê dinav pêlên hizra da Melevanîya dikit..

Dengekî gût:

– dê bira dê,tû jî ya xwe bêje,da demê me biburt!

Serê xwe jinav tuza hizra da îna der:

– demê ez girtîm,ez zava bûm....!
(tilîlî bilind bûn,digel awazên zirnayê,evînî kirin.

Xüşka wî bixemla xwe ya şirîn ve,wek bilibleka aşiq dinîva dîlanê biherdû lewendîya dileyîzit.

Pismamê wî,yê har bûy,xwe liser tilên pîya jorda dihavête ser kundika û lidûr xwe dizivrt.şeq şeqa tilên wîye,wek kutrekê nêr lidûr dutmama xwe dizifirt.

Xwehê leşê dutmamê yê har kirî,haha dê xwe havête nav sîngê pismamê xwe da.

Dîlan ya hare,çermê deholê çirîskên agirî yên jê di peşin,pîka zirinayê mey ya jê dibart...!)

– tû zava bûy?!

Laünî nevîya rista hizirên şêrku bibirt,zanî yê çûye dîwana büka xwe,bersiva xodanê pirsîyarê da:

– şeva zavatîya wî bû,em hemü dikeyveka mezin da dijîyan,şahîya wî em hemü kum kir bûn..

Dengekî gût:

– hîvî dikim hün jî binivin!Demê suhbetê dê her hebit.

Cihê şêrku ev şeve gelek xuşe,serê xwe dana ser milê xwe ü pişta xwe da wî dîwarê hişik ü req.

Ew dîwarê hizar peyam liser nexşandîn.

Çavê wî biwê rêza liber royê wî ket.

"Kurdistan yan neman.." Cilvek vê ket,serê xwe bilind kir,lidur xwe zifirî,ka kes wî nabînit?!

Paşî bidizîve çavê xwe lihindek rêzên dî gêrand.

**"Ax welat,azadî,heware ka xudê?yara min,dayka min,ez xelkê Kurdistanê me,bijî karker,lênîn û markis, dadwerî serwere...!"**

**Zanî ew ne mêvanê êkêye,ü na bite yê dawyê.zanî derketin jivî gorî gelek ya bizehmete.**

**Divîya ewjî tiştekî liser wî dîwarî binîvêst.lê jinûynuka zêde çi nebû,nûynukên wî hêşta dinazik bûn,hêşta xün jê diza...!**

**- ez dê navê te û yê xwe liser vê dara tûyê nexşînim.**

**- ne,wenekî.!Dê xelk bînit ü dê bab û birayên min tore bin!**

**- hemü dizanin tû ya minî.**

**-raste,lê hêşta te ez aşkira ne xwastîme.**

**- dê vê gavê çim te xwazim.**

**- tû gelek yê bilezî....?**

**- ez sotim bû lêvên te.**

**- nê eve deh cara te mêtin.**

**- bêhna min pê naêt.**

**- dîyare te jilêva pitir divêt?**

**- eha te linîvê da..**

**- hişîyar be...!Çi daxwazyên jimavê xwe zêde nekey!**

**- heker min carekê daxwazîyeka mezintir kir....?!Dê çi kî?**

**- dê bêjimete xwe bigire.**

**- heta kengî?**

**- heta tû bibîye zava.**

**- heker ez mirim berî bibime zava....?!**

**- wîî..!Wene bêje,ez jî dê xwe havême dinav gorê te da.bila me pêkve veşêrin....**

**Çavên wî tijî xew bûn,stûyê wî xav bû.Peyva dawyê liser dîwarî ketîye ber çavên wî,yara min bû.**

**Stûyê wî kete ser mila,hindî leşê wî jixewê xerîb bibû, her zü kete nav pêlên giranên xewê da.**

**Dilê wî yê jar,mejyê wî yê westîyay,hizirên aloz,bire dîwana yarê....**

**Biçükekê dû salî,beref wîve kire xar.qesta bersîngê wî kir.**

**- babû,babû..**

**Herdû destên xwe bû ve kirin û jierdî bilind kire dinav sîngê xweda.**

– navê te çîye law?

– navê min welate.

– tû kurê kêy?

– ez kurê teme....!

Kenî..Kenîya wî jituxîbê xewnê derket.

Çavên xwe liwara gêran,ka çi dayk ü bab lidüv wî biçükî na ên....?!

Jina wî:jidür,gelek jidür:bicilkên bükanyêve,dikire xar ü qesta wan dikir.

– ew kurê te ye!Bigire,nehêle berze BIbit!

Her jidür xwe havête her düwa,dane ber sîngê xwe ü dinav sîngê xwe da şidandin.

– eve kurê teye,piştî te em hêlayn,yê hatîye cihê te.

– kurê min?!

– erê..Eve welate welat!

– te navê wî kire welat?

– ma ew ne omêda te bû?Ma hevala ne digûte te babê welat,Hêşta jîyê te deh sal bûn?

– raste,raste,ez babê welatim.

Destê jina xwe girt û welat kire dinîva xwe da ü beref çîyay çûn.

Her diçûn,her dinîya tarî dibû.Ba û birüsî dijoar dibûn.

Welat da ber sîngê xwe,jina xwe lipişt xwe veşart..

Tarî dijwar dibû,dengê gorga bilind dibûn.

Birüsî jibin pîya agir dirêt,volkan jiçîya diza.

Lidemekî welat jiber sîngî peşî nav gorîya volkanê da.Jin jipştê veqetîya!

Ma bitinê,kire hewar,bizav kir,xwe havête welat, neşîya rizgar Kit,lijinê zivirî,jin berze bû.

Dengê dergehê zîndanê û qemçîya jiwê çîhana kirêt,îna çîhaneka kirêt tir!

– hilûn sey baba,eve ne cihê xewê ye! Azad,saman,serdar,mîrzu,lawîn..

Hilûn hün mêvanên îzraylî ne,ger gera hewe ye!

Dane ber qontax pestala ü birine der.Hewar ü qêryên hevala,banê zîndanê kun kirin.

Eve karê wane,her çend şeveka diên,wek pez firoşa,hindeka jê digirin û bû ser birînê dibin.

Her çend şeveka,hosa dibite şerê wan digel mirinê,mirin jiwê zîndanê dür na kevit!

**Leşê şêrku yê bûye av.haha dê dinav xweha xweda xendqit.Hewarên hevala bêhna wî pitir teng kir,nezanî eve çi serubere,nezanî dê wan hevala kîve bin?!Nezanî çi lihîvîya wîye?!**

**- eve çi bû?!**

**-....**

**- dê wan kîve bin?!**

**-....**

**- bû min bêje?Da ez jî bizanim?!**

**Recivkê ser jiaxiftina wî stand.**

**wî kelexê çi bersiv bû pirsîyarên wî ne dayn.Destê xwe havête milê wî û kêşa nik xweve:**

**- ne tirse!Tû jitirsê mezin tirî...**

**- bû min bêje,eve çi bû?!**

**- ew birin birîyara dadgehê bi cih bînin!**
**- birîyara çi?!**
**- her kes û bextê xwe.**

**Binive binive,me ev şeve jî jîyyê may!**

**Tirsa wî zêde bû,xweha leşê wî her ya dizêt.Çavên wî dîsan biwî dîwarî ketin.**

**(ey reqîb kes nelê kurd mirduwe)**

**Dengê dadwerî biser recifka leşê wî zal bû:**

**- navê te....?**

**- eve deh cara min gûte te,şêrku.**

**- ez man dirêj ne be,hindî pirsîyarê bersivê bide.**

**-....**

**- jyê te?**

**- hejde bû,nihu çi nemaye dê bite nuzde.**

**Serê xwe kire dinav wan kaxezên liber desitî da û berê xwe da bejna wî.**

**- eve çend care tû hatîye ber destê min?**
**- eve deh care..**

**- ji ber çi?**

**- jiber min çi nekirîye.ü tû dibêjî bizifirînin heta danpêdanê bikit..**

**- heker te çi nekirîye?Bû tû danpêdanê dikî?!**

**Leşê xwe yê sipî û nazik nîşa da ü gût:**

**- heker vê litejî bikin,tû dê hizar cara danpêdinê kî!**

**Dadwer lê xorî:**

**- ev tiştên liser te hatîne nivêsîn rastin?Te ev hemü dijatîye û kare dijî şoreş ü hukmetê kirîne?!**

**- bi keyfa te ye..**

**- bi keyfa min çewa,bê mejî?**

**- heker min gût ne,dê bawer kî?**

**- nexêr.**

**- dê çi birîyar dî?**

**- dê te zifirînim cihê tû jê hatî.**

**- nene, min ne zifirîne cihê ez jê hatîm.Erê min ew hemü kirîne û hizar cara pitir.**

**Bêy devê xwe bibite bin gohê hevalê xwe yê destê rastê û yê destê çepê, gût:**

**- were livêrê îmza bike.**

**- eve sed cara îmza...**

**Dengê dadwerî bilind bû,gazî navekê dî kir...**

**Milên wî girtin,birine cihekê dî,vê carê mil girtina wî, newek carên dî bûn,vê carê dirêyekê ra birin,ne wek wê rêya têra înayn.Vê carê kesê neda ber tep û mista,vê carê,çavên wî biçi patên reş ne girêdan û ne birine çi bindavên tarî....**

**Zanî dê tiştek dijîyana wi da ête gohurîn,lê nezay dê çi bit!**

**Dengê wî tûlazê liqolaça zîndanê nivîstî,hizrên wî digel recivka leşê wî têkel kirin,û digel pêlên kenîya xwe ya bilind birin.**

**Kenî,girî,xirîkên giryê kenîya wî xendqandin û hêlane digerîyê ra.**

**Girî,girîyeka dijwar,leşê wî wek bîha diavê da recifî. Kete ser devê xwe,xwe kire qormik,dengê wî bilind bû,recifka wî zêde bû,kef tijî devê wî bû.**

**Hevalên birex ve,zü litana wî hişîyar bûn,destên wî girtin,enîya wî perxandin,dengê ayat ü dua bilind bûn.**

**Piştî xewê dilê wî mirandî,dinav destên hevalada ketîye dixeweka giran da,hemü hişîyar bûn.**

**Şêrku çav diserda zîq bûn,bêhna wî bizorî dilê wî diêxte karî:**

**- ne tirse şêrku,netirse,çi lê nehatîye.**

**- wî xêre?!**

- dinav destên van kafira da,hemü tişt jidest dayne.

- hün bawer dikin,gelek cara ez jî hest dikim,dê rojekê dîn û har bim?!
- ne,hişîyar be!Xwe ragire,divêt em xwe liber bigirin. ma wan çi jime divêt?Wan divêt em hemü har û dîn bibin!

- erê,erê wan divêt em bibine amîr didestên wanda.

- raste,lê ew dê bû wan bite xewin,ew dê peqin ü nagehne wê Miradê...

Jor ker bû,hemü man hilawîstî,hizir bibûn ser kêşê hemüyan,gelek jiwê cargoşê zîndanê gelek dürtir birin.

Gelek liber sîngên jinên xwe bûne mêvan,gelek birine dîwana yarên wan.

ewên mejyê wan jihizir kirinê ron bûy,gerdenên wan bûne mêvanên werîsekê zifir.gelek digêleşoka hizra da livîn jê nehat!

Dengê dergehê zîndanê,hemü înane ser wê rastîya dijwar:

- xwarina hewe ya cara dawyê,piştî vê xwarinê,xwe amade kin,bû sêdarê..

Dergeh lipişt xwe girtin,bikenîka çêkirî beze bûn.

Hevalekî xwarin îna nîva zîndanê û ewên dî lidur kum bûn:

- şêrku..Tû bû naêy bixûy?

- hewe goh lê ne bû çi gût?!

- çi gût?

- piştî xwarinê,sêdareye!

- gohê xwe nedê,ev sê çar heyve em livêrê,her roj sê çar cara we dibêjin,bila her bêjin heta bipeqin. Were bixû ma me nihu çi digût?

- dê ew bit ya xudê vîyay..Dê ew bit ya wî vîyay...

Her çend şeveka wek ser birên pezî dikevne nav,hindeka jê digirin û dibine cihê ne zifirînê.

Her çend rojeka hindekên lawaz û bê hêz diînine cihê wan..

Şev û rojên wan diwê zifirokê da dibûrin:

- evro jihemü roja pitir birin,cih fireh bû,dibit lirojên bêt gera me bit!

- dibit..Lê ev cihê fireh bûme na mînit,dê tijî kin!

- raste hemüya dibine sêdarê?!

- raste, raste!

- çu hîvî nemayne bû jîyanê?

- hîvî..?Tuvê hîvîya libîyabana şîn nabit!

**– nihu termê hevalê min lawîn gehiştî ye mala wan.. Nihu xelik hemü liguvenda wîye.Nihu dayk ü babên min,jina min liguvenda wa xwe dixûn!**
**– erê..Heker termê wî nîşa mala wî bidin!**

**– çê?!**

**– çine.. Çine.**

**– 12 –**

**Pişta xwe ya daye dîwarî,herdû destên xwe yên havêtîne bin zikê xwe ü hşik şidandîne,her çendekê berê xwe didite zikê xwe yê hevit heşt heyvî,ka hêşta licihê xwe ye,yan ewjî hatîye dizîn û gehiştî ye babê xwe?!**

**Liser hemü dirindatîya fasişta,liser hemü agadaryên wan ra,liser tirsandina xelkî.dinîya hemü liwê kulanê kum bûn,**

**Girî ü zêmar tijî hemü cihaye.**

**Jina wî,dayka wî,xüşkên wî.Govenda xwe girêdayne,tilîlî û hewarên wan,gohên milîyaketa disimin.**

**Bab û bira,digel Mam û pismama,neşên jikuna xanî derkevin:**

**– nabit behî û şînîya wî danin.**

**– nabit kes bête serxuşîya hewe.**

**– nabit termê wî dinav gorstanê da bête veşartin.**

**– xaîn bû,xwe firoş bû..**

**Çend carekê hosa beşdaryê dixema êkî da dikit, her wekü termê şêrku linîva malê dirêj kirî.**

**Dibite hewar û qêryên wê û dayka şêrku,heta dikevne erdî û jihay diçin..!**

**Vê carê,wê jidil hest bibêhna şêrku kir,wê zanî,ev terme yê jiber tenişta şêrku hatî,wê hest kir,haha şêrku dê silav kite bejna wê..**

**– eve çî ye?Zikê te yê mezin bûy?!**

**– erê,eve heşt heyve dizikê minda,ma dê her biçük bit?**

**– dê kengî bime bab?**

**– xwe bikire,heyvek ya may..**

**– heyveka dî maye..?**

- erê,heyvek ya may.

- Ez neşêm xwe bigirim.

- divêt tû xwe bigirî.

- ne,ez jî dê çime didilê teda,dibit kurê xwe liwêrê bibînim..

- kurê te?Heker kiç bit?

- dê wek te ciwan û şîrîn bit.

Bişkurîna wê rengê giryê jidêmê wê revand,serinca dayka şêrku rakêşa:

- were kiça min,da biçine mal,ev rawestîyane bû te ne başe..

Hate ser hişên xwe:

- ez naême mal,bêhna şêrku ya jivî termî diêt.

- raste kiça min,wî xwe gorî şêrkuy kir,wî tola şêrkuy ya vekirî.

- pa bû termê wî digel xwe ne îna....?

Giryê ser jidayka şêrku stand,milê wê girt ü berev mal bir.

Her liber derî,qesta jora xwe kir,hêşta textê bükanîya wê yê raêxistîye,hêşta tijî wan kun û qolaça bêhna wîye.

Eve xakên wîne,eve şütka wîye ..

"- bila şütka te jikirasê min bit,da sebra min pê bêt,heker tû jimin dür ketî.

- ez çicar jite dür nakevim.pişt rastbe."

Dengê zêmara jinan,hizrên wê cemandin.Cilfek vê ket,dengê wê jigewrîya wê derket:

- şêrkuu..Şêrkuu...ka tw?Te direw limin kir.Te gût ez te nahêlim?Ez jite dür nakevim?Şêrku,şêrkuu..

Kete ser textê bûykînîya xwe.ewê tinê çend demjmêreka liser nivîsitî ü xêr jê nedîtî.

- ev texte bidilê teye?

- tû bidilê minî.

- erê ez dizanim,lê min nevêt çi tişta byê dilê te bikim.

- her tiştê tû bikî,binîva dilê mine.

- xwe heker ez te linîva vî bazarî maç bikim?!

- erê,texsîr neke..

Kenîya wan biser bazarî da bilind bû,serinca hemüyan rakêşa.

Bişkurîna wê bû kenî.ew rondikên berî çend çirkeyeka liser rûyên wê,digel kurîşkên kenîya wê çûne xwar.

Janeka dijwar,hemü hizrên wê digel xemên wê, têkel kirin û dinav pêlên xweda êxiste gevizkê...

Axîn ü hewarên wê gehiştine gohên dayka şêrku:

- texêre kiça min?

- heware,zikê min dê peqit.

- xwe ne tirsîne,demê te çi nemaye,dê xûdê keremê kit.

- heware ez mirim.
- divêt tû xwe newasitînî,ü çi hizra nekey,were pîçekê binive da pêhina te bêt.

Dirêj kire ser wî cihê birex textê wê ve danay,û liser dinivit,suzdaye liser textê xwe ne nivit,heker şêrku liber tenişta wê nebit.

Lipişt serê wê ronişt,destê xwe dana ser enîya wê:

***

- dadê?Dadê?

- bêje kurê min te xêre?

- dadê,heker min jin îna,tû dê hezjê kî,wek heza te bû min?

- nexêr,ez jigîyanê xwe pitir hez jite dikim.kes cihê te didilê min da nagirt.

- heker min gelek hez jiwê kir?

- bila,ezjî dê hez jê kim,lê ne wek heza min bû te....!

- dadê hîvîye jimin pitir hez jê bike.

- wey..Her wekü te êk biçav kirîye?!

- ne..Lê heker min êk biçav kir.

- bawer bike,ez dê jidil hez jê kim.

- heker pîçek ya xirap bit?

- dê difina wê birim.

- dê hêlîye bê difin?!

- erê,heta xwe baş bikit.

- paşî dê difina wê bû êxîye cihê wê?

- erê,û dê xizêmkeka zêrî jî kimê.

**Xwe havête nav sîngê dayka xwe da û kenî jiherduwa bilind bû"**

*****

**Hêşta destê wê yê liser enîya bûyka wê,dengê janên wê kêm bû,çavên wê ketin ser êk,jihay çû, ew patê birex ve biserda da ü dergeh lê girt û derket.**

**Liber dergehî,dengê zêmar û qêryên jina hate goha,hişên wê kum kirin,berê xwe da wê hewşa vala,bê dengyê hemü tişt yên mirandîn,çi livîn ü jîyan têda nemayne.**

**Wê he cihê hatin ü çûna wîye,wa he baxça golaye, ewa wî bidestên xwe dirust kirî,her çendekê golek jê dikir û bû yara xwe dibir,eve cihê yaryên wîne,**

**libiçûkatîya xwe gelek libin vê darmêwê diroynişt û yarî dikirin.**

**Dengê dergehî dîmenê şanoyê gohart.**

**Dû sê mirova milên babê şêrku yên girtîn,wek mirovekê mirî dinav destên wan da xweya dikit.**

**Kire xar wek har û dîna,beref kuma wan çû:**

**- eve çî ye?wî xêre?!**

**- netirse xüşkê,dilê wî yê hatîye girtin jiqehira.**

**- heware,babê şêrku,baxive,texêre?**

**Xwe havête ser kelexê wî.**

**Êk lê xorî ü gût:**

**- zübe cihekî bû dane,ne demê hewar gazindaye!**

**Linîva hewşê,liser rajêrkekê dirêj kirin,hemü lidûr kum bûn,hindek ava tezî lirûyên wî kirin ü enîya wî perxandin.**

**Çavên xwe vekirin,tijî hindav serî mirovin:**

**- xêre?!Çi bûye? Şêrku hat?Kelexê wî înan?!**

**Pîremêrê birex ve,destê xwe dana ser milî:**

**- çi nîne,navê xudê bîne,çi çêne bûye,tû pîçek ji hay çubûy,lê supas bû xudê,nihu tû yê başî!**

**- ey hewar...Bû eve hate serê me?Ma me çi kîye?**

**- navê xudê bîne,ji rehma wî bê hîvî nebe.**

**- heker yê sax ba,da em tiştekî jê zanin!**

**- heker xudê nekit,tiştek lê kiriban,wek lawîn û hizarên dî,da termê wî hinêrin.**

**Eve ne ditirsin û ne şerim dikin!**

**Êkî dî xwe havête nav sehbetê da:**

**- erê babê şêrku,hindek piştî çend sala jinü dîyar dibin.**

**Hevalê wî destên xwe bilind kirin:**

**- xudê goh lidengê te bit,û rojek bêt û bête derî..**

**Gelek denka pêk ve gûtin:**

**- amîn, amîn.**

**Dayka şêrku digel axînkekê gût:**

**- çewa memo hat,ew dê wesa êt!**

**- dibit ya memo jî direw bit,û yê sax bit?!**

**- muxtar hevalê wane,wî biçavên xwe dît demê kelexê wî kirîne dinav hindek pata da ü nîv şev berze kirîn.**

**Bê dengyê xwe biser kuma wanda girt,hemü şir kirin,her wekü dibê gîyan.**

**dema sîbera wê lihindav serê wan wek îzraylî rawestîyay.**

**Bê dengîya wan zêde bû,hemü man lihîvîya wê,ka dê çi bêjit?!Ka goh liwê suhbeta berî wê gavê kirîn bûye,yan ne?!**

**Rengê har û dîna dida,kerb ü kîn jiaxivtina wê di barîn:**

**- ka şêrku?!Ka termê wî?!**

**- were kiça min,navê xudê bîne,çi nebûye.Mamê te yê wastîyay bû,nihu yê başe,jime hemüyan sax tire.**

**Mam rabû ve,liser cihê xwe ronişt:**

**- were kiça min,rone nik Mamê xwe,dê şêrku her êt, dê her zifirt,şêrku yê saxe..**

**- kê gût?!Te tiştek goh lê bûyn?!**

**Serê xwe kire dinav destên xweda,bidengekê melül:**

**- dilê min dibêjit..**

**Ewê birex ve gût:**

**- dê êt,ma çi kirbû?Jiber çi girtîye?Heta nihu çi lê nekirîye,wesa dîyare dê berdin..**

**Herdû destên xwe pitir bizikê xwe ve şidandin,her wekü haha dê tiştek jinav cilkên wê kevite bin pîya:**

**- hewe tiştek yê zanî û hün bû min na bêjin!**

**Sê çareka pêkve sond xwarin:**

**- binavê xudê me goh liçi ne bûye.**

**- bi serê şêrku tiştek nü nîne.**

**- kiça min,Mamê te pîçek yê nesax bû,me jinav zelama îna mal da pitir bêhna xwe vedit.Tû jî bes dilê wî biêşîne...**

**- ez derdê wi dizanim,ez baş dizanim êşa wî çîye?!**

**Dayka şêrku axînkek rahêla:**

**- ew êşa me hemüyane,wê êşê dilê me hemüya kul kir.**

**Dengî babê wî bilind bû:**

**- ay..ay şêrku,te çi îna serê me?Çi hate serê te?Ka kelexê te?Ka tû? Ka tû..?**

**Giryê ser jihemüya stand,vê carê mêvana jî beşdarî divîstevala girîya wan da kirin.**

**Dengê dergehê hewşê vîstevala wan bidawî îna:**

**- mizgînî..Mizgînî..**

**Dayka şêrku û jina wî pêkve gûtin:**

**- şêrku berdan?!Şêrku berdan?!**

**Xudanê mizgînyê,rengê wî zer bû,serê xwe şor kir:**

**- biburin,înşala ez dê wê mizgînyê jî van roja gehînme hewe.**

**- xêre?Çi bûy?!**

**- ma hewe ageh jidinîyayê nîne?Dengê tûpa haha dê goha ker kit.berê xwe bidine serê çîyay,agir yê biserê wan da dibarit!**

**Destê xwe dirêj kire wî çîyayê lipêş çavên hemüyan bûye(berê reş),hemüyan divên tewav bikin, hemüyan divên maç bikin,hemüyan divên wî erkê pîroz liser milên xwe rakin!**

**Çîya yê bûye dûzexa sor,barana kerb ü tol vekirinê ya biser serê dojmina da dibart,tülên mîrî xwe di latên çîyay da dihavêne xwar,ewên ne peqîn û ewên ber biagirê hêrişa pêşmerga neketîn,berev deştê revîn.**

**- dê we bikin,mergê me hemüyan gorî hewe bit.**

**- eve tola lawîne,eve tola welatekê bin deste,eve tola me hemüyane!**

**Devê wê tijî bişkurîn bû:**

**- eve tola şêrkuye,eve tola babê welate!**

**- kiça min,dê tola wî hizar cara ête vekirin**

**Her wekü lêve bûy jiaxivtina xwe ya berî nihu:**

- kes tola wê venakit,jibilî kurê wî welat..

Destê xwe lidur zikê xwe werand û baş şidand,her wekü welat yê dinav deştên wê da yarîya dikit.

Hemüya divîyan bizanin,çi rodaye?Çi tiştê nü heye?

- ê...?!ka bêje? Çiheye?Çi nîne?

Devê wî beş bû,xwe havête dinîva wan da,cihê xwe xuş kir:

- dibêjin pêşmerge,haha dê êne dinav bajêra da, dibêjin bihêzeka gelek mezin û çekekê giran yê hêrişa dikin,dibêjin...

Tilîlyên dayka memo,suhbeta wî birî,derê hewşê kire taq û hilda jor,dengê wê biser kulanê da diçû xwarê:

- tola memo vekirin,tola şêrkû vekirin,tola lawîn vekirin.. Tilîlî.. Tilîlî..

Dayka şêrku jipêşve çû û milê wê girt:

- were rûne,texwe kuşt.

Devê xwe bire bin gohî:

- çibûye?Çi deng û bas hene?

Ne rûnişt,her jipîyave:

- lipêgova sed leşker û pêncî cehşik kuştîne,likanî masyê,yazde bingehên leşkerî sotîne,ligelyê duhokê,sê serbaz û bîst leşker girtîne,liçîyayê gare, helîkuptirek sotîne, li.... ü li....ü li...

Herçendekê dibû tilîlyên wê û biherdû lewndîya di reqisî!

Eve karê wê ye,jiroja hestyên kurê xwe memo dinav şelê wî da ligorstana şaxkê libin kumeka bera dîtîn.

Ya har ü dîn bûy,şev û roja likulana digert,sohbeta şoreşê û deng û basên şerî û pêşmerga belav dikit.

Dinav behî ü dewata da,liçayxane ü xwaringeha, liher cihê jimirovekî pitir lê bit,wek îzgehekê şoreşê ye.

Xwarin û vexwarina wê,likulana ye,hemü çavê xwe didinê,hemü gelek hez jê dikin.

Piştî gelek gor hilkulayn,piştî gelek kelutên bera vedayn,piştî hemü gorstanên deverê têkvedayn.

Duxüna memo jiwî şelê rizî rakêşa û bilind kir.zanî eve hestyên wî ne,zanî eve duxüna wîye,zanî eve dîyarîya dutmama wîye.

Duxün bilind kir,hest jê firîn,bercest neman,çav hişik bûn,ezman lal bû,pêstîrkê kirt.tinê hizra şîya dîmenê roja dutmama wî ew duxün bû kirîye dîyarî sax kit:

– memo,memo..

– belê dutmam?Keremke?

– eve cara êkêye ez karekê hosa dikim.hîvîye bidilê te bit.

– eve çîye?

– duxüneke.lê niza ka dê bidilê te bit yan ne?!

– erê,binîva dilê mine.rengên wê çend dişirîn û ciwanin!

– eve rengên ala kurdane.

– wey babû?Tû jî ya bûye sîyasetmedar?!

– ma tû her car stirana pê nabêjî?

"Kesik û sor û zere,ala me kurda..?"

– birastî te hizreka baş ya kirî!Dê sebra min gelek pê êt.

– jiber rengên alay..?Yan jiber karê destê mine?!

– jiber her dû tişta...

Kenî bilind bû,pêlên kenîya wan şîyan hindek jihestên wê kum bikin.

Jiwê rojê,û her lihindav kuma hestiyên wî,duxüna wî lipişta xwe şidand.hestyên wî jinav wan berexşka înane der û kirine didanga xwe da,û birine dinav gorstana bajêrî.

Gorekê nü bû kulan,nivêja mirîya liser kirin.

Jiwê rojê heta evro,ew Melayê nivêja mirîya liser Hestyên memo kirîn,hêşta yê berzeye ü ne hatîye mala xwe.

Jiwê rojê dayka memo,ya bûye êzgê deng û basa.

Her kesê sûhbeta şoreşê bikit,her kesê behsê şerî bikit,her kesê navê pêşmerga bînit.

Gohdarên wî dê bêjinê,te ev axivtine jikîve înayne?

Heker got,min jiêzgeha (muntîkarlû)goh lê bûyne. Yan j dengê emerîka,yan ji "bî bî sî !"

Dê serê xwe hejînin û bawer nakin!

Lê heker gût min jiêzgê dayka memo goh lê bûye, dê devê wî beş bit û dê bêjit:

– ê? Bêje,çi gût?Çi sûhbet kirin?

Dayka memo,ya bûye kanîka deng û basên wan. Kes newêrt limala xwe goh bidite radîwya,kes newêrt suhbeta dinyayê bikit.

Tinê ew çend sûhbetên dayka memo likulana dikit, wan têr dikit.

Hemü hêlan mendehûş,devê wan tijî bişkurîn kirin. Beref kulanê çû,dengê wê ü tilîlyên wê,hêşta tijî hewşê bûn.

Her çend dergeha diçit,hindek lê kum dibin,wek derwêşa bû wan erebanê lê didit,hemüyan dihal dibit,wê şevê têr dinivin,lihîvîya rojeka geş dimînin.

– şivêdî liSilêmanyê çil bingehên leşkerî sotîne,pitir jidûseda kuştîne,sê sed cehşik gehiştin rêzên şoreşê, jibilî çek û cebilxanan,pêncî serbaz êxsîr kirîne...

Hindek jitirsa,hindek jikeyfa,cih hêlan û berev malên xwe çûn.

Dayka memo,berdewame liser karê xwe,kulan kulan,dikan dikan digerîya.

Gelek cara reşekên mîrî,devê wê girtîne û likunên tarî girêdayne.gelek cara tirs nîşa dayne,lê neşîyayne tîrên tilîlyên wê berze bikin.

Gelek cara liser cadê,likulana dayne ber dar û qamçîya,lê pitir har û dijwar bûye.

Vêca wan jî dest jê berdan,gohên xwe qîr kirin.

Her kesê ew bibînin gohdarîya wê bikit,yan harîkarîya wê bikit.

Ew kes wek gûnehbarekê mezin diête hijmartin.

Ew kerb kîna neşîyayn digel wê bikin,hemyê biserê ü kesî da barînin.

– tilîlî, tilîlî lî lî..Sed ligare kuştin,pêncî girtin,dû firoke sotin, tilîlî lî lî..

Bijî Kurdistan bijî pêşmerge..

Dinav cada giştî derbaz bû nîva bazarê mezin. Herkesê dengê tilîlyên wê dihate goha, dizanî rûdaneka xuş ya rûday.Xwe dinav qolaçên dikanên xweda diveşartin gohên xwe bel dikirin,dibit çend gotineka werbigirin,da bişev liteniştên jinên xwe şeva xwe bê bikine roj!

Ewên rêbwar,xwe nêzîkî rêya wê dikirin,devê wan tijî bişkurîn dibûn.

Hemüya dizanî ev keyv û tilîlîn rûdane mezinin.

Bû reşekên mîrî jî aşkira bibu.

tilîlyên wê xüna wan zer dikir,lerzuk diêxste çavên wan,selîqa rêveçûna wan digohart!

Hemü diçûn liçavkên dî digerîyan,da pitir bizanin ka çi rû daye?

– herbjîn hûn,her bijîn...eve tola memoye,eve tola şêrkûye,eve tola lawîne,eve tola hemü kurdane, tilîlî, tilîlî lî lî...!

– 13 –

– evro gelek birin!

–....

Çavên wî yên zîq bûyn,dengê xwe bilind kir:

– min gût evro gelek birin!

Bêy serê xwe jinav destên xwe bînte der:

– erî...Evro gelek birin.

Neşîya xwe licihê lê rûniştî bigirt,her wekü agir libin pîya,rabu ser xwe linîva zîndana çar goşe hat û çû:

– dibit sobehî gera me bit?!

–.....

– tû bû bersiva min na dî?

– bibure,te çi gût?

– sobehî gera me ye.Kes jihevalên me nemaye!

– netirse,nuke dê tijî zîndanê heval kin.

– dibit,lê em jihemüyan kevin tirin,tinê em yên mayn.

– em jî wekü wan.

– ne,divêt ez ne mirim,divêt ez kurê xwe bibînim, divêt ez bijîm..

– jîyana bina destî,ne jîyane.

Gûhên wî şor bûn,ew tirsa didilî da bû gorîya agirî ü leşê wî kewand,çi jê nehat.neşîya dîwara bisimt. neşa banî maç bikit.neşa binê pên xwe hilkolit. divolkana kerba xwe da helîya.

Zîndan bê denge,tarîye.sermayê cihê îzraylî yê girtî. tirs paşayekê bê hevtaye.

Ew çend bihûstên zîndanê,yên bûne gorepaneka werzşî.

Dengê tanik û zirîpoşa jilivîna mişk û sîsirka diêt.

Mirin birîyareka dayîye,ew çend gavên dinavbera zîndanê û sêdarê da,astengin dirêya bicih înana birîyarê.

Wê sîsirka bê mulet,eve pitir jideh çara hate ser enîya wî.hişên wî kum kirin:

– tû bêjî,ev şeve gera me bit?!

– nene,dê me hêlin bû tuvî!

Serê xwe baş jinav hirza kêşa der,berê xwe da nav çavên wî.çi nedît jitaryê:

– tû yê bilezî?Yan ditirsê?!

**– tirs?Ma tirs bû kengîye?**

**– ne tirse,dê her me sêdare din.**

**– sêdare?**

**– yan golle baran kin!**

**Reçivka wî zêde bû.**

**– golle baran kin?!**

**– dibit me bisaxî bin ax kin.**

**Tirsa wî,agirê recifka leşê wî zêde kir.liser hizra wî zal bûn,kete ser çûka,pêstîrkê girt.**

**– bin ax?!ü,ü bisaxî?**

**– erê,û dibit me lipêş çavên dayk ü babên me,golle baran bikin.**

**– heker kurê min bînine pêş çavên min,bila min biwî rengî bikujin!**

**– kurê te?**

**– erê,kur yan kiç.Min Mirade bibînim,bila çend çirke bin.**

**– qet bawer neke,tû bigehîye wê Miradê.**

**Serê xwe carekadî berda dinav herdû destên xwe da û bidilekê pir kuvan:**

**– te kurek yê lipişt xwe hêlay,dibit rojekê tola te vekit.**

**Hişên wî hatine serî:**

**– ma te çi biçük nînin?**

**– min hebûn.**

**Ji cihê xwe,xwe havête birex ve,û xwe nêzîk kir:**

**– çi lê hatin?!**

**Dengê wî awazên giryê jê dipeşîn.**

**– hîvîye bela xwe jimin vekî.**

**– bextê teda,çîroka xwe bû min bêje.berî bimirim da ez bizanim neyê bitinê me.**

**– ma çi hatî ye serê te?**

**– ma tû min nabînî?!**

**– eve ne çî ye lipêş geleka.!**

**– û ya te?Çi hatîye serê te û mala te?Min gelek cara divîya pirsîyar bikim,lê hevala digûtin jê bigerin, bîra wî ne înin.**

**Nuke em û mirin yên lihîvîya êk,vêca ya dilê xwe bêje,berî bin ax bikî.**

**Zanî neşêt xwe jipirsîyarên wê biparêzit,zanî çi nemaye dê digel gîyan û kelexê xwe wan xema bin ax kit.**

**– min kurek û kiçek hebûn.**

**–ê?!**

**Xwe pitir nêzîk kir,çavên wî man lidevê hevalê wî.**

**– kurê min gelek nesax bû,çi çare nebûn dinav şoreşê,ne dixitor ü ne derman.**

**– ne bêje mir!**

**– xozî mirba...Heker mirba,dayka wî û xüşkaü da mînne sax û ez jî ne dihatime girtin!**

**– hewar ü sed hewar,te ez dîn kirim,dê bêje,çi lê hatin?!**

**– heval û gondîya gûtin,bibe bajêrî,dixitorên baş hene.**

**Xwe jivî rexî havête rexê dî.**

**– em jî şevekê pêk ve hatin,da bêne bajêrî.**

**– tû û kî?**

**– ez û jina xwe û her dû biçük.**

**– erê.. ü paşî?!**

**– li nîva rê...**

**Devê wî ma vekirî,neşîya baxivit.**

**– ê?!**

**– em ketin büsa leşkerî.**

**– ey hewar,nebêje hemü hatin girtin?!**

**– xuzî hatiban girtin.**

**– hatin kuştin?!**

**– bêy çi agahdarîya bidine me,liher çar rexa em dane ber agirê çekên xwe.**

**– bes, bes..Yadî xweyaye,te dilê min peqand, xodê Harîkarê te bit!**

**Bê deng man,ketin dizifroka hizirên dijwarda.Axîng tijî zîndanê bûn:**

**– û tû çewa maye sax?**

**– xwezî ez jî digel wan hatibam kuştin.**

**Axînik zêde bûn,digel hizir ü xemên giran têkel bûn, dengê giryê jê hat.**

**Ew girî..Hevalê wî girî..Kes nebû destê xwe limilên wan bidit û bêjitê,negirîn,girî ne dermanê derdê heweye.**

**Dengê dergehê zîndanê,girîya wan kire tirs.**

**Kum kume hildane jor,dane ber pestal û qamçîya, tijî zîndanê mêvan kirin.**

**Mêvan gelek diwesîyayne,dibirîndarin.Her êk kete birex yê dî ve,dixeweka giranda berze bûn.**

**Şêrku û hevalê xwe,ew kelexên nîv mirî têkvedan, av bidevên wan da kirin,birînên wan zoha kirin.**

**Axivtin jikesê na êt,gelek jiwan eve çend heyvin divî seroberî da.gelek jiwan,jixwe bê hîvî bûyne,ü bidevê xwe birîyara nemane xwe dayne!**

**Cih carekadî tenge,lê bêhna şêrku pitir firehe, dizanit şoreş ya likare,dizanit nehatîye jibîr kirin.**

**Dibit gelek jivan hatibine tolên hevalên xwe,xew jê sil bû.hizir dinav xüna wî da tirîyake.**

**- ez dê çewa kurê xwe bînim?!**

**Kesê goh lê nebû,wî jî nedivîya ev gûtine bigehte gohên kesê.**

**- kurê min dê navê wî kine welat.**

**Bişkurîna wî,nav çavên wî hemü girtin.**

**- babê welat.**

**- belê dayka welat,te xêre?**

**- welat yê çûye nav biçüka û gîro bû,ka serekî lê bi de.**

**- bila,eve ez çûm.**

**Çend kolanên rex û rûyên malê têkvedan,çend biçûkên liwara pirsî,bihemü dengê xwe gazî kir.**

**welat nedîyare,welat berzebû.**

**Xelkê wî bajêrî hemü pêkve likulana,liaqara,linav mala gerîyan.dengê wan tijî hemü dinîyayê bûn.**

**- welat.. Welat..**

**Kesê bersiv neda.**

**Kete çol ü çîya,gond û aqara.Libin wê dar tûya gelek cara jivan digel dayka welat hey.**

**welat ya xwe kirîye qormik û nivîsitî.**

**Da ber sîngê xwe û berev mal bir.**

**Liêvarî welat hişîyar bû:**

**- tû kî?**

**- ez babê te me.**

- babê min yê mirî,tû ne babê minî.

- babê te ne mirîye,ez babê te şêrku me!

- ne,tû direwa dikî,babê min yê mirî.

Xwe jinav destên wî havête der ü revî.

wî da bidûyve û ew revî,çend cade ü golanên bajêrî têkvedan,neşîya bigirt,bêhna wî teng bû, devê wî hişik bû,axivtin jê nehat.

Her welat direvî ü xwe diveşart,her şêrku lidewsa wî digerîya.

Berî likulaneka teng pistukê wî bigirt.

Turmbêleka cam tarî,wek bayê birusyê jikulana beramber dibezî.

Linîva cadê wek dû evîndara êktir maç kirin.!

Şêrku kire hewar.tayêrên turmbêlê kirine hewar. Dengê maçkirina wan,hemü hiş jiserê şêrku birin.

Bihemü hêza xwe ew zîndana ker tijî deng kir:

- welat....

Hevalê wî zü hişîyar bû,milê wî girt ü da ber sîngê xwe.

Sê çar mêvanên nû jî jixewa giran rabûn,wan hizir dikirin,hêşta yên libin erdî.Eve îzrayle gîyanê hevalekê wan bizorî dizî.

- şêrku,te xêre?

- wey hewar,heker eve ne xewin ba,ez da bidirustî har bim!

- xewin û rastî yên liber me berze bûyn.

- binivin,bû xwe çend çirkeyeka binivin,berî gîyanê me bû heta heta mînte nivîsitî.

- biburin,min hün hişîyar kirin.

- mala te hizar cara ava,te ez hişîyar kirim,ez dixewneka gelek jiyate grêt tir da bûm.

- biburin,me pirsîyara hewe ne kirin,hün kîne?Jiber çi girtîne?

- ez ü çar heval kurdin.ewên dî em jî nizanin çi kesin.

- dê behsê girtina xwe kî?Yan behsê xewna xwe?

- divêt behsê herduwa bikit,ma me çi heye jiblî gohdaryê heta gera me bû mirinê dêt.

Hemü man lihîvîya livîna lêvên wî yên qeşavî.

- biburin,ez neşêm behsê xewna xwe bikim.Ew ne xewne,ew rastîye.

- rastîye?Rastîya çi?

**- berî min bînne vî cihî biçend roja,ew kar yê rüday.**

**- karê çi?**

**- ez neşêm bû kesê bêjim,bila digel min bin ax bibit.**

**Careka dî serê xwe dana ser milê xwe ü pişta xwe da wî dîwarê hişik.kasêta hizirên wi ser jihişên wî stand.**

**" - dê rastyê bêjî yan..?**

**Serê xwe yê giran rakir,jina wî,dayka wî, xüşka wî, yên dinav destên wan robotada.**

**Biçavên tijî xün ü rondik,qêrîyek rahêla.esman aviz kir,birusî lêk ketin,barana sor barî.**

**- heker rastyê ne bêjî?Ewa dî tû dizanî?!**

**- min bikujin,min bisojin,min bixon.Wan berdin,wan çi nekirîye.**

**- me ristî divêt,tinê rastê.**

**- rastîya çi?Min ageh jiçi nîne!**

**Çavê xwe liwan robota neqand.**

**- karê xwe bikin,eve rastyê nabêt.**

**Bendojkên wan vekirin,sîngên ros dîya kirin.**

**Hewarên wî dijwartir bûn,digel qêryên dayk û jin ü xüşkê têkel bûn.**

**Serê xwe kire dinav sîngê xweda.çavên xwe neqandin.**

**Serê wî bilind kirin,çavên wî bizorî vekirin:**

**- divêt tû hemü tişta biçavên xwe bibînî.**

**- ne ne, hewe çi divêt ez dê bêjim?**

**- me divêt,tû navên hevalên xwe û berpirsê xwe,û ka hün çend kesin?Û digel kêne?Û hewe çi libere? Bêjî da em jite razî bin.**

**- ez dê hemü tişta bêjim,min hêz û şîyan neman.**

**- eve ez yê lihîvîya axivtina te.**

**Her navek,her hevalek,dîyar dikir.Robota parçeka cilkên dayka wî,jina wî,xüşka wî .ji ber dikirin.**

**Piştî jilîsta nava û her karên kirîn ü yên nekirîn ü yên tinê goh lê bûyn.bi dawî hatî.Hemü linîva jorê bê stare kirin.**

**Milên wî girtin berev bindaveka tarî birin.Qêryên dayka wî,jina wî,xüşka wî.heta bindavê bidüfra dihatine goha.Piştî derê zîndanê hatîye girtin,nezanî çi hate serê wan!**

**Lê çi şev nînin,dûcar sê car.lipêş çava dixewneka kirêt da ne êne kirêt kirin...."**

– bira,heker te nevên behsê xewna xwe bikî,em barê te giran nakin?

– pa dê behsê girtina xwe bike.Tû çewa hatî ye girtin?Eve çende tûyê girtî?

– wek min gûtî,xewin û rastî yên liber min berze bûyn.ez nizanim ka ew rûdan xewin bûn yan rastîne?!

– wesa dîyare,hevalê me gelek hatîye êşandin?!

– biburin,ez neşêm çi bû hewe bêjim,hîvîye hün bela xwe jimin vekin.

Bê dengî bû,hevalê taryê,hemü dinav pêlên xweda veşartin.

– eve çende hün livî cihî?

– şev û roj na êne hijmartin da em bizanin.Lê jixwarinê em dizanin,eve pitir jisê heyvaye!

– ji xwarinê?Ew çewa?!

– şev ü roja ,carekê xwarinê diînin.

– hün gelek bûn?

– her çend rojeka bireka wek hewe diînin ü pştî çend rojekên dî,hindeka jê digirin û dibin.

– kîve dibin?!

– em nizanin!Ez bawer dikim,dibine sêdarê!

– sêdare?!

– kes nezifirîye vê jorê,her kesê birî yê berzeye.

Şêrku jinav hizirên xwe derket:

– eve çend e tû yê girtî?

– nêzîkî heyveke.

– berî tû bêye girtin,termê kesê ne îna deverê?Çi behs ü xeber hebûn?

– her çend rojeka termek dihat.Berî girtina me termê lawîn û sê hevala înan.

Dengê şêrku digewryê da asê bû:

– lawîn?!

– tû lawîn dinîyasî?!

Hevalê wî gût:

– berî heyvekê licihê te bû...

Tirs tijî serê wan bû,recivkê dilê wan dagîr kir,axivtin jibîra hemüya bir,wek jijîya xwe dinav pîstê xweda Veşartin.ew hîvîya xirş dinav destên wanda berhavêt.

Bidengekê nizim û tirsnûk:

- piştî jime razî bûyn.her tiştê wan vîyay me dayê. Helbet dawya wê sêdareye.Me bidestê xwe ya îmza kirî!

- tû gelek êşandî?

- ne gelek,jiber goneha min ya aşkira bû,min neşîya çi berevanyê jixwe bikim.

- goneha te çi bû?

- gelek çek û fîşek limala min girtin.

- te bazirganî pê digirin?

- nexêr,yên şoreşê bûn,min jihevala werdigirtin,û bû wan dihinartin.

Xwe pitir nêzîkî wi kir:

- dengê şoreşê çewa yê xorte?

Dengê xwe nizmtir kir, lidûr xwe zifirî.jitaryê zêde çi nedît.

- şoreş bizotekê agirîye,dilê dojmnî disojit.

Berê xwe da banê zîndanê,axnîkek veda:

- dojmin jî yê bûye gorgekê har,kes jê rizgar nabit, ne biçük,ne mezin,ne jin û bê goneh.ter ü hişka pêk ve disojit.

- dîyare..Jivê jora em têda dîyare,

lê neşêt milletê me bivî rengî qir bikit.

- erê,weye.Çewa heta nihu hün hêlayne sax?!

Kenîyeka xav jilêvên şêrku derket:

- jîyê me yê biçüke,heta em biêne jîyê sêdarê,dê gera me êt!

- ez bawer nakim,ew çi rêza bû vê çendê danin!

Ew yên jihestê mirovayetyê hatîne şüştin.

Ew ne mirovin,ew mirov xurin!

- hevalên te goneha wan çîye?

- niza,min livêrê yên dîtîn.

Destê xwe dinav pêlên taryê da gêran,heta ketî ye ser kelexekê nîv mirî.

- tû kî?Navê te çîye?

Kelexî xwe nik wî ve xoşand,serê xwe dana ser ranê xodanê dengî:

- navê min Usmane.

**– kak Usman,tû jiberç livêrêy?**

**Pişta xwe da dîwarî, cihê xwe pitir xweş kir:**

**– mirovên min hemü hatine girtin,û birine bakurê îraqê,bê seruşün bûn,min jî karê xwe kir û lidüv dewsa wan çûm.**

**– ê û paşî?**

**– min zanî yên nêr hemü bisaxî bin ax kirîne,ü yên mê...**

**– bêje,kak Usman,namüsa me hemüya êke.**

**Çi lijin û biçüka kirîn?!**

**– jin...,jin yên kirîne "sebaya"û firotîne dewletên dewr ü bera..**

**– ü biçük?!**

**– hindek licihên taybet xodan dikin û hindek jî digel zelama bin ax kirîne û hind digel jina firotîne.**

**Dengekî neşîya xwe pitir bigirt:**

**– ey hewar,ma me çi kirîye?Ma em ne bendên wî xodayne,ewê lipêş çava,vê diînne serê me?!**

**– te çewa ev hemü tişte zanîn?!**

**– min pitir jinîveka malê xwe da,heta min ev rastîye zanî.**

**– ê,ê û başî teç kir?**

**– piştî min ev rastîye zanîn,ez zifirîm mal,min neşîya xwe neaxivim,ez ligelek ciha axivtim,min nameyek bû şoreşê jî hinart ü hemü tişt dîyarikirin.da ewjî bizanin.**

**– sîxur ü hevalên dujmna tijî hemü cihane,tû daye girtin?**

**– erê,ez girtim û piştî jimin razî bûyn,gûtin divêt tû rojê nebînî!**

**– ew baş dizanin,şoreş û xelkê Kurdistanê bihemü gonehên wan yên dirinde agadare.Lê wan divêt hêcetek hebit,da me pê kunehbar kin.**

**Dengekê şêlî,sala şîyabû şün tilên xwe liser awazên wî dîyar bikit.**

**– çi nemaye van gawra lime ne kirî.Hêcet dizorin,û ya jihemüya aşkira tir.ew dujmnên mene.**

**– ew dujmnên hemü mirovayetyê ne.**

**– erê Mamê hecî,kuştin,girtin,talan,derkirin....**

**Eve hemü karên şerî ü dujmnayetyê ne.em dirazîne, dujmnayetîye.**

**Lê ewa eve dikin,ne karê çi mirovaye,jin kirêt kirin,biçük firotin,gond sotin,berze kirina zana ü Tolazên berketî... Û...**

**- eve karê diz cerdecîaye,eve nekarê çi hukmetaye!**

**- kî dibêjit ew hukmetîn?! Kî dibêjit ew mirovin?!**

**Ma hün nizanin çewa hatîne ser hukmî?!**

**Axivtin bû ger ü dur,gelek cara rihên kerb ü kînê di gehiştine pila xwe kuştinê,gelek cara jibê umêdîya wan,pêlên kenîyeka zer lêvên wan dixemilandin.**

**Wesitîyan,tirs,hizir,birs,nexoşî,bê umêdî,birînên rizî. Dibûne hevdijê xewê.Xew ya sile,nerazîye,neşîya ligovenda kelexên wan yên nîv mirî bileyîzit.**

**Direvî,xwe diveşart,wek îzraylî,jiwî erkê giran,xwe likun û qolaçên zîndanê diveşart.**

**Îzrayl ü xew,herdû jikarê xwe ne dirazîne.Lê ewjî jihindekên jixwe mezintir ditirsin.Lewa bela xwe jiwan kelexa ve nakin!**

**Îzrayl yê libenda robota,da bên wan kelexa rakêşne ser depê sêdarê,da ew bela jiwî vebit.**

**Xew gelek ya xwe dargiran dikit,û hewil didit,hindek jiwan kelexa dinav pêlên xweda bixendqînit.dibit digel wan pêla biçine dîwana yarên xwe,daykên xwe,biçükên xwe!**

**Sist bûn,livîn kêm bû,xew har bû,oksicîn bû tirîyak.**

**Serê şêrku kete ser milî..**

**Dengê dehol û zirnayê tijî mejyê wî ye.govend şarîya,mêvan tijî wê kulana liber dergehê mala wanin,babê wî kîskê xwe yê tütinê jiêkî wergirt,di havête ber yê dî.Pismam dimijülin,xüşik na rawestin, dayka wî mayê xwe dihemü tişta dikit.**

**Berê xwe da wê şenge bûka birex xweve:**

**- wahe kiça kêye wesa ciwan dileyîzit?!**

**- ew kiça teye!**

**- kiça min?!**

**- erê kiça te evîne..**

**- û ew biçükê he?**

**- ew kurê te welate.**

**- ma min çend biçük hene?!**

**- te ji bîr kir?Ma te ne gûtîye min dû kur ü dû kiç divên?**

**- pa ka her dûyên dî?!**

**- iha wahe xodana lewendyên zer kurdê ye,û ewê yarîya dikit kurdu ye!**

**- welat,evîn,kurdu û kurdê..**

**Eve navên biçükên minin?!**

**- erê,eve her çar biçükên mene,ma ne bidilê tene?**

**- binîva dilê minin...belê pa eve çi dewate?**

**- eve dewata meye.tû zavay û ez bükim.**

**- pa çewa me ev biçüke hene?!**

**- ew didilê meda bûn,ü nihu hate pêş çavên me, da em berhemê evîna xwe bibînin.**

**- erê tû bêjî eve ne xewin bit ez têda?!**

**- xewina çi?Ma tû wan biçavên xwe nabînî?**

**Dengê deholê bilind bû,zirna har bû,tilîlî azirîn, govenda reş belek dixuhê werbû hîvî dixünê da kelîn.**

**Dergehê zîndanê vekirin:**

**- şêrku, emer....,....,.....**

**Hilûn seybaba,eve ne cihê nivîstinê ye.**

**Hilûn gera heweye...!!**

**- 14 -**

**Dû robota milên wî grtin,dengê sê çarekên dî lirexên wî dihat.**

**Çavên wî bipatekê reş hişik grêdan,destên wî biqeydeka granda asê kirin.dengê kavil kirina gonda jizincîrên pêya dihat!**

**Beref bilindahîyekê birin.**

*******

**Dû pîrejina destên wê grtin,sê çarekên dî birexve royniştin,dengê janên wê esman kun kirin.**

**Beref wê tormbêla amade birin..**

*******

**Liwê bilindahyê rawestandin,bizimanekê bîyanî goh lihindek axvtinên req ü dijwar bû.**

*******

**Liser wî textê liwê jora xestê,dirêj kirin,lihindav serî dev û çavên bişkurîne..**

*******

**Bêy çi berevanîyê jigîyanê xwe bikit.werîsekê zivir gerdena wî maçî kir.**

*******

**Gelek berevanî jigîyanê xwe kir,gelek xwe nazidar kir,dû kiçên nazik zendên wê şidandin,bitilên xwe yên zirav,pirça wê şe kirin.Xesûya wê,berî bihêlte dinav wan destên nazik da,maçek lienîya wê ya xohday da.**

*******

**Ew werîsê zivir teng bû!**

*******

**Bêhna wê teng bû**

*******

**Werîs arîya**

*******

**Jan zêde bûn.**

*******

**Werîs har bû.**

*******

**Jan dijwar bûn**

*******

**Xilfa werîsî gehişte êk.**

*******

**Zendên wê dinav destên wan kiça da sist bûn.**

*******

**Ew kelexê dinav wê xilfa werîsî da,jierdî bilind bû, çend livînekên bê omêd jê hatin,sist bû,xav bû.**

**dû rondikên sar jiwê bilindahyê ketin bin pîya.**

*******

**Hîvî nêzîk bûn,jan dijwar bûn,bêhn vedaneka kür, dû rondikên germ ketin ser rûya.**

*******

**Bêy çi deng ü hewar,bêy mirov û heval,bêy kes wê bîrozbahîya gelek xewin pê didîtin bigehîntê.**

**gîyan bû kutireka sipî.**

*****

**Bihewareka dijwar,biqêrîyeka har,biwestîyaneka êkcar,ew jor tijî deng kir.**

**Piştî çend çirkeyeka,dengê hîvîya wê jor xemiland, hemü lihindav serî kum bûn,pîrozbahî gehandinê.**

*****

**- Eve ew jî çû,kelexê wî bû dayka wî bikine dîyarî.**

*****

**- Eve bû te kurek ciwan û şirîn peyda bû.bû bapîrê wî bike dîyarî.**

*****

**Kelexên wan digel gelek kelexa litormbêla siwar kirin û beref malên wan birin.**

*****

**Pêçûlka xwe da bersîngê xwe,xesûya wê milên wê girtin ü beref mal çûn.**

*****

**"Sindirüka" wî ya bê stareye.biçi ala ne nexşandîye. liser banê wê taksyê,beref mala babê wî dane rê.**

***

Bişkurîn û kenî,tijî ser ü çavên wê û xesûya wê ne, dîyarîya wan ya dinav destên wan da yarîya bitilên destên wan dikit.

***

Tormbêl gehişte ber derê mala babê wî.

Berî wî xelatê liser banê wê taksyê bû babê wî bikine dîyarî.

Tormbêla dî gehişte ber derî.

***

Bab ma hêbetî?Nezanî eve çi rûdanin?

Berê xwe da wê tormbêla "sindirük"liser...

berê xwe da wê tormbêla pêçolk jê derketî.

Dinav herdû dîmena da gêj bû.çavên wî zivirîn, divîya xwe pavête ser wê "sindirüka"danaye ber pîya û nizanit ka kî têdaye?

Dizivirî wê pêçolka sava.divîya bidite ber sîngê xwe ü têr bêhn kitê!

Ne zanê çi bikit?!Hişk rawestîya.

Qêryên dayka şêrku neşîyan bînine ser hişên wî, hewarên heval û cîrana pitir hişk kirin..

Çend xelkê bajêrî liwan kum bûn,sindirük danane bersîngê babê wî.

Hêşta xwe ne havêtî ye ser wê sindirüka gîyanê wî têda.

Jinê pêçolka xwe dana ser û xwe havête ser herdû kelexa.

Bîner man mendehoş,axivtin jikesê ne hat,ev dîmene gelek ma.

Pîremêrekê dan emir,hest kir û ew pêçolka sava, hewarên wî diçûne ber esmana,jinav destên wan îna der ü da destê pîrejinekê:

– evî biçükî jivêrê dür bêxin.

Jinu hemüya hist kirin ka çi rüdaye.

**Wek vulkaneka har,kirî û qêrî ü xwe qotan tijî cadê bûn.**

**Hewar û tilîlyên dayka memo,agirê dilê wan dijwar kir.Linîva jina wek hirçeka har,xwe veçirî ü da ber tep ü msta.**

**- heware daw memo,ma tû salê çend cara diêye kuştin?Ma te çend gîyan û leş hene?Heware.. Heware..!**

**Hemü dîsan har kirin,hemüya pêkve wek tîpeka deng bêja kirine hewar û qêrîn.**

**Vê carê hemü jikevilujankê tirsê derketin,vê carê hemüya pê liyasa ü birîyarên mîrî danan.**

**Vê carê dengê hewar û behîya wan gehişte gohên hemü reşekên mîrî,vê carê behîya wan bibû şoreşa nerazî bûnê!**

**Reşek neçar bûn,birîyar dan gohên xwe tijî qîr bikin, bila serê xwe bixon,bila esmana kun bikin,tinê nêzîkî toxübê gîyanê wan nebin!**

**Bibû derfeteka baş bû xelkî,ewên çicara şêrku ne dîtî ü ne nîyasî jî.qesta mala babê wî kirin û beşdarî divîstevala behîya wî da kirin.**

**Tirs jibajêrî dür ket,hemü lêk kum bûn,sohbet ûaxivtin tijî hewşê bûn:**

**- dibêjin çekên giran gehiştîne şoreşê!**

**- erê,sê çar serok çete bihemü çekên xwe ve gehiştîne nav rêzên şoreşê..**

**- dengê xwe bilind neke,dîwar bigohin.**

**- ma heta kengî em dê jidîwara tirsin?!**

**- heta dîwar bikevne bin pîya!**

**- biserê te ew roj ya nêzîke!**

**- dîyare te tiştek goh lê bûye,ü bû me na bêjî?!**

**- dîwarî,çi heval nemayne!Cîhan hemü jê nerazî ye.**

**- ew çewa?!Bawer nek?!**

**Hevalê milê çepê gût:**

**- ez jî bawer nakim,heta duhî cîhan hemü wek sa bû direwî !**

**- erê,raste, lê nihu ne duhîye!**

**- dê ka bêje,heker te tiştek nü zanî bit?!**

**- şoreş ya germe,hevalên wan her yên zêde dibin ü yên van her yên dür dikevin jiber şaşî ü dirindatîya wî.**

**- eve ne egerên pişt rastin,divêt em pişta xwe bi kesê rast nekin,ma ewa hatîye serê me,me jibîr kirîye?**

**- hiş, hişin eve muxtar hat.**

**– silam elêkum.**

**–.....**

**– xudê sebrê bidite hewe.eve birîyara xudêye,kes neşên birîyara wî rawestînin...elfaatîhe...**

**Jibilî dûsê dîndara,kesê fathe digel ne xwand,kesê bixêrhatina wî ne kir.**

**Kitkite derketin.jor hêlan vala,bêy xatira xwe jibabê şêrku jî bixwazin,her êk bû xwe çû.**

**Her şeq şeqa tizbyên muxtarî zêde dibû,her dîwana babê şêrku vala dibû.**

**Wek berîkanê lê hat,heta tilîlyên dayka memo, hemü rakirîne ser rastîya ew têda!**

**– tilîlî.. Tilîlî lî lî.. Şivêdî likanîmasyê deh bingeh sotin, ligare bîst kuştin,liçiwarte sed girtin.Tilîlîlîlî..**

**Çavên muxtarî şor bûn,tizbyên wî bê deng bûn, dibin mujîlankên çavara,berê xwe didayê ka bişkurînê lêvên kê grtîne?!**

**Lê gîyanên wan jituxübê tirsê derbaz bibûn,gelek denga gazî kirinê:**

**– were dayka şehîd memo,te xwe wastand,texêre? Çi bûye?**

**- Ez qet nawastim,hindî şoreş ya germ bit...tilîlîlîlî!**

**Biherdû lewendîya leyîzî û bikulanê da çû xwarê,tijî bidüv ve biçük bûn.**

**Liser xemên xwe yên giran,liser bêhişîya xwe.**

**girnijînê lêvên babê şêrku nexşandin,çinemabû digel dayka memo rabite leyîzukê!**

**– 15 –**

**Biherdû destên xwe yên biçük,dergehê hewşê palda û hilda jor.**

**– dadê, dadê..**

**– texêre welat dayu?**

**Bêhna lê teng bûy,axivtna ü bizorî biser dikevit:**

**– dadê..Babê min hat!**

**– babê te wê he lijor!**

**– ne ew bab!Babê min şêrku!**

**Rast da xwe û rabû ser pîya!**

**- şêrku.....?!**

**Gohên bapîrê wî bel bûn,bîra wî xwe nêzîk kir:**

**- şêrku yê çi kurê min?!**

**- belî,babê min û hevalên xwe hatin.**

**Da ber sîngê xwe û dinav pêlên giryê da berze bû.**

**Dengê wî jinav sîngê wê da bizurî biserket:**

**- ma te ne gût,babê te pêşmergeye?!**

**- belê,belê,babê te pêşmerge bû.**

**Dengê peqîn û gulla biser girîya wê ket.Welatî serê xwe jinav sîngê wê îna der û gût:**

**- hê..?Hewe goh lêye?Eve babê min û hevalên wî ne?**

**Hemü man hêbetî,dengê "şivan perwer" jibilind bûyekê dihat**

**"- Wa hatin pêşimergên me...**

**Şel ü şepik libejna wan..**

**Eün ronîya çavên me..**

**Golên sor bidin destan..."**

**Cade tijî tolazin.hemü biçekin.tilîlêyên jina digel dengê gulla têkel bûn.**

**Babê şêrku,qesta ser banî kir.Agir yê bibaregayê reşekên mîrî ve.**

**Her kesê bişêt bipîya biçit,qesta cihên reşeka dikit,û didestada çek ü dar kêre..**

**Jorda hate xwar,qesta wê kelişta dîwarî kir,hindek gilêş veda,birnoyeka dar şüşe îna der û tijî berükên xwe vîşek kirin û xwe havête nav pêlên mirova, ewên har û serxoş bûyn.**

**Kulan kulan,lireşeka gerîyan,ewên revîn, neşîyan lipişt xwe bizivirin,ewên mayn,bûne tola şehîda.**

*****

**Biherdû destên xwe yên qirêjî û xünelû,ewên jiber boyax kirina pêlava,rengê nazikîya xwe jidest dayn, dane dergehê hewşê û hilda jor.**

**- dadê, dadê..**

- texêre welat dayu?!

- dadê,te xwe amade kirîye?

- jibû çi xwe amadekim kurê min?!

- ma tû nizanî evro dengdane,em dê perlemanê Kurdistanê helbjêrin?

- belê dayu,ez baş dizanim.

Dengê xwe nizim kir.

- eve Mirad û hîvyên babê te bûn,madê çewa jibîr kim!Ü gîyanê xwe kire qorbanî vê rojê..

- dadê?Ez dişêm beşdaryê bikim?

- nexêr,tû yê biçükî.

- ez dê jipêş babê xweve dengî dim.

Tijî gewrîya wê girî bû.

- nabit,ez gorî,tû hêşta yê biçükî,û jîyan ya lipêşîya te,dê gelek carên dî dengdan çêbin.

Berî destê bapîrê xwe û yê dapîra xwe bigirt,û dayka xwe bidite pêşîya xwe û biçin:

- dadê şelê min yê dirîyaye,ma hün êkê dî bû min na kirin?

- belê dilê dayê,parên xwe hilgire ü bû xwe bide bi şelekê bidilê xwe..

***

Biherdû destên xwe yên qirêjî,dergehê hewşê palda û hilda jor

- dadê, dadê..

- were welat dayu,texêre?

- dadê ez şerim dikim biçime dina hevala.

- bû kurê min?!

- dadê,ez yê mezin bûym,û hêşta kevnên kurmamê xwe dikime ber xwe!

- kurê min,çinîne,me kesê karî nîne,tû yê liber xwandinê.xwandin dê paşeroja te geş kit ü dê jiber mineta êye der.gohê xwe nede gûtinên neheza.

- ma kes pirsîyara me na kit?Ma babê min xwe gorî çi kirî ye?

- babê te xwe gorî welatekî bin dest kirîye,û nihu dû welat hene,tû û Kurdistan..

- bawer bike ez neşêm biçime nav heval.

- jiber çi?Divêt her dem serê te yê bilind bit,tû kurê şehîd şêrkuy .

- lê kes wê nizanit,kesê ageh jime nîne.

- dîyare tû yê ketîye tura evîndareka ciwan û şirîn?!

- ez neşêm xwe nîşa çavên wê bidim,ez şerm dikim.

- wey..Dîyare raste?!

- erê.. Wek te ciwane.

- heker wek min ciwan bit.divêt bite razî bit û lomey te nekit.

- bawerke wê çicara ev behse ne kirîne,her dibêjit dê rojek êt û bihayê zehmeta mala hewe ête dan, mirov ne bicilka mirove,mirov biaqil ü zanînê mirove.

- ew kiça babê xweye,babê te ne lihîvîya çi berambera bû.tinê wî omêda welatekî hebû.

- hindek heval dibêjin..

- çi dibêjin?

- babê te xwe kurî welatî kir,û Mamê te xwar..

- dibit,lê wek hevala te gûtî,dê rojek êt û berhemê xüna wî dîyar bit.

- kengî?Ez dinav kevnên pismamên xwe da rizîm. Hemü dizanin eve cilkên wanin!

- ne kurê min,xwe ture neke,were sehke televzyunê.

- çi derketîye litelefzyunê?

- berê xwe bidê,ala Kurdistanê û ya emirîka liser çîyayê Hesenbegê hatine bilind kirin.Û bireka kewa berdane çûlê.piştî rikehên wan şikandîn.

Hizra bire axivtinên şêrku...

"- xuzî mejî şîyaba ala xwe liser çîyayn xwe bilind bikin,wek hemü dinîyayê,xuzî me jî şîyaba hemü girtîxana,rikehên kewa,kunên tarî,livî welatî bişkênin..

Destê xwe bidevî vena:

- xuzî min bidilê xwe ev lêve maç kiriban,xuzî min bi dilê xwe ew enîya herdem girê liser vî sîngî nivandiba..

- ma kê destê te girtîye?!"

Bişurîna wê tijî nav çava bû,welatî hest kir hizrên dayka wi jiwê jorê derketin.

- dadê, tû kîve çûy?

- tû dizanî babê te sera kewekî gîyanê xwe ji dest da?!

- ma te ne gût,babê te pêşmerge bû?!

- belê,hizareha pêşmerga gîyanê xwe sera vî welatî jidest daye.

- lê te gût,sera kewekî?!

- erê, kew tinê hêcet bû.

- ew çewa?Min tê bigehîne!

- tû bixwe dê têgehî,lezê neke.

- ma te ne gût dê bûte penteronekê nû kirim?

- belê,bila pare bêne destê min.

- kengî dê pare êne destê te?

- dibit piştî çi kew ne mînine dirikehan da.

- ma kî dê şêt kewên Kurdistanê hemüya berdit?!

- divêt hemü kew bêne berdan.

Dayka memo dîwana wan tijî tilîlî kirin:

- hewe dît?Hewe zanî?Ala kurda bilind kirin,ala me bilind bû,hewe dît?Hewe zanî?Çend kewên girtî hemü berdan?!

Kenîya wê sist bû,dêmê wê pêtî bû,.xwe havête ser çûkên xwe, û kizgiryok tijî gewrîya wê bû:

- ew jinü yê kewa berdidin.ew jinü pê hesîyan.

Memo berî çend sala kew berdan,memo berî wan kew berdabûn.memo berî wan kew berdabûn...!

Dest pêk

1- 8- 2005

Nürnbêrg

hesen îbrahîm

Dîyarî..

Bû dayk ü bab ü jin ü biçükên.hêşêta berhemê xüna xoştivyên xwe xêve ne kirîn!

**Hesen îbrahîm**